

Konsolosên Tirk ji kêfa difirin

Apociyan Newroz di xwînê gerandin

□Êrişen ser şevêne pirozbahî yên Newrozan li ser biryara PKK dimesin û pilankirî ne.

□Gelê Kurd û hêzên pêşverû û demokrat ên Ewrûpa, nefreta xwe li hemberî êrişen ser Newrozê nişandan.

□Konsolosên Tirk ji alîkî de kêt dikin ji alîkî din de jî di riya rojnamên burjuwazî de dixwazin vê êriş han wek şerê nav kurdan, wek teror û bê serûberiya nav Kurdan nişan bidin.

Apociyan, bi hov û hovîtiya xwe di meha Adarê de li ser riya dijmin gavnê pêşdetir avetin û bîyîr girtin ku, tu komel û hêzên Kurd li wela-tênen Ewrûpa şevêne pirozbahî yên Newrozê çênekin. Li ser vê bîyîrê li Almanya Federal, li Holanda û Yewnanîstan bi demançe û bombê agir û kêt û daran êriş birin ser şe-

vên Newrozê, bi dizî agir berdan komelan, sewitandin. Li nav Kurdan geriyan bi tehdîd û xapandînê hewl dan ku, tu kes neçin şevê pirozbahî-yê. Gotin "emê êriş bibin ser salonan" yan jî "me bombe xistiyê, wê biteqe"

Roja 7'ê Adarê, li Munihê, çend seet berî destpêka piroz-Dûmahîk r.7

Xwene her tişt bi gotinê ye

Çi cara ku devê berpirsiyaren PKK (Apociyan) ve be ew ji bilî xwe "mora xayintiyê" bi hemû hêzên şoresger û welatparêzen Kurdistanê ve dizeliqinîn. Meriv li demagojîya wan binêre, hemû partî û rexistînen Kurd "taxîmî destikin xayin ên bi maska rexistînen siyasi maskekirî ne." Di beyan, belavok û rojnamen xwe de hero duro propagandê xwe li ser vê mantiqê avadikin û li ber çavê endam û hevalbendê xwe wan dikin hedefa êriş, di derheq endamîn partîyan de bîyîrê êriş û kuştinê didin û destê xwe û xwina şoresger û welatparêzen Kurd dadikin.

Lê gava meriv were ser rastiya jîyanê ya berbiçav, di mesela "xayintiyê û xizmetkariya dijmin" de, rî li ber gotin û beyanên demagojîk tê girtin, kar û barê jîyanê bi xwe derdixe ka gelo kî xayin e ki ne xayin e; yan ka gelo kî bi tevgera xwe xizmeta dijmin dike.

Heta iro, her çiqas PKK'ê bi carê bêhejmar êriş birine ser hê-zên siyasi yên Kurd, ser xelkê; Kurdê şoresger, welatparêz an bêguneh kuştine, bi êrişen xwe xebat û tevgeren hêzên Kurd ên li hemberî dijmin pûc kirine jî, zû bi zû kesi "mora xayintiyê" li wan nexistî. Hela hela, heta iro, 4 û hêzên din, êriş nebirine ser endamîn wan, ser kar û barê wan. Çi şerî ku di navbera wan û hêzên siyasi yen din de derketibe jî tim li ser êriş wan bi xwe derketiye. Hêzên din tim, hay ji mesûliyeta xwe kirine, nexwestine şerî li hemberî dijmin bikin şerî Kurdan ê navxwe. Bes xwe parastine.

Tevi wiha ji berpirsiyaren PKK mora "xayin ilan kiranê" ji destê xwe danayinin û ci gava dilê wan dixwaze, hewl didin ku mora xwe li eniya hezekê an keseke xin.

Lê gelo her tişt bi gotinê ye? Ma ciyê karê meriv li ber çavan be, "gotin" ci jehre dixwe. Ne hewce ye ku em kûr û dûr herin buyer û rûdanê kevnare vekolin, hemâ em li van buyerên meha dawiyê yên li Ewrûpa bûn, binêrin. Heger divê mor li eniya hî-nekan keve, ev buyerên dawî jî adresâ morê baş didin xuyakirin:

Li welatên Ewrûpa her sal Kurdêñ welatparêz, kirêkar, xwen-devan, xort û penaber li gelek bajaran Newrozan piroz dikin. Pi-rozbahîyen Newrozê li nav Kurdêñ li Ewrûpa, bûne, ahengen adetî û gelempir. Di pirozbahîyen de ruhê welatparêziye Kurd xurttir û manewiyata gel di riya rizgarixwaziye de bilintir dibe. Pirozbahî dibin qada tevgera dijî dijmine dagirker û xwînwar. Di Newrozan de kampanya mezin li hemberî dijmin tê vekirin, rûresîya wî li ber çavê gelin Ewrûpa tê raxistin û pişgirîya van gelan bi gelê Kurd tê xurtkîrin

Îsal Newrozê karekî hîn berbiçavtir jî girt ser milê xwe. Ordîya Tirk di 4'ê Adarê de bi 30 balafirê xwe, bi top û tankên xwe êriş pîribû ser Kurdistana Iraqê. Loma jî Newrozan isal, li hemberî vê êrişê dibûn protestoyê xurt. Li dijî diktatoriya faşist a Tirk, raya giştî ya Ewrûpa şiyartirdikirin. Gelek rîexistin û szûzûmanenê

Ewrûpa de haziriya wê yekê de bûn ku dengê xwe li hemberî vê êriş han bilindkin. Diktatoriya faşist ji van protesto û karan gelek bi hêrs bû. Rojnamen burjuwazî eşkere vê yekê didan nî-sandan.

A di demek wiha de, hevalbend û endamîn PKK êriş birin ser şevêne Newrozan, li gelek bajaran şer derxistin, şevêne pirozbahî-yê herimandin. Komele şewitandin gelek însan birîndar kirin yek hat kuştin. Tevlihevîk wilo li Ewrûpa çê bû ku, êriş ordîya Tirk bi tevayî ji ber çavan winda bû, şer û kuştina Kurdan ya xwe bi xwe derket manşetîn rojnamen û mirkêne televiyonan, dilê diktatoriye rehet bû wek tasek ava sar bi ser dilê wê de hatibe da-kirin. Ü tevgera rizgarixwaziya Kurd li ber çavê kesen sade yên Ewrûpa hînejin din "terorist" hat xuyakirin, navê Kurdan bêtir xera bû, bêtir xelkê xwe ji tevgera bî dûr xist û.h.w.d..

De ka iro em hemû Kurd kumê xwe deynîn ber xwe û hînekî bîfikirin: kî ne yên xizmeta pûc kirina tevgera rizgarixwaziya Kur-distanê dîkin. Lê hela hela, heger emê mora xayintiyê li eniya hî-nekan xin, ma gelo emê li ya kî xin! Xwene her tişt bi gotinê ye, kar li meydanê ye.

Newroz hat pîrozkirin



Qamîşlo- 1987

- Li gelek bajarên Kurdistanê pûlên Newrozê bi dîwara ve hate zeliqandin.
- Li Kurdistanê Suriyê partî û rîexistînen Kurdan tev bi hev re Newrozê pîrozkirin.
- Li Ewrûpa digel êrişen Apociyan, Newroz di nav pêlên gel de hate pîrozkirin.

Îsal ji salen berê hîn xurttir û xweşikir Newroz hat pîrozkirin. Li Kurdistanê digel hemû tedbîr û kontrola dijmin Newroz bi tevgeren piçûk be jî hat pîrozkirin. Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan ilâwek xususî ya Pêşengî derxist li her derê Kurdistanê belav

kir. PPKK ji bo Newrozê hin pulen diwanar çapkir û li gelek bajarên Kurdistanê li dîwar û bi cama xistin. Li ser pûla "21'ê Adarê Cejna Newrozê pîroz be!", "Agirê Newrozê Bîlindkin!" nivîs bûn. Pûl him bi Tirkî û him jî Kurdi hatibûn çap kirin.

Dûmahîk r.2

Êrişâ Cuntayê li Ewrûpa hate protestokirin



Piştî êrişâ Ordîya Tirk ser Kurdistanâ Iraqê, li gelek we-latênen Ewrûpayê partî û rîexistînen Kurdan ev êrişâ hov protesto kirin. Welat û bajarênu ku tevgeren protestoyê lê hatin çekirin ev in:

Danîmarka;

Li dijî êrişâ Tirkîye ya ser Kurdistanâ Iraqê di 13'ê meha Adarê de meşik mezin hat çekirin. Meşvan li pêş buroya Turizmê a Tirkîye kom bûn û bi sloganan êrişâ Tirkîye protesto kirin. Piştî viya, hemû-yen meşvana çûn ber Mala Koma Mileta ya Danîmarka-yê. Komîta meşê ji berpirsi-

yarê Koma Mileta daxwaz kir ku ew êrişâ cûnta faşist protesto bikin.

Piştî vê jî, meşvan çûn zi-yareta Kurden ku li ber parlamentoyê di grewa birçibûnê de ne. Komîta Meşê ji wan hevalen di grewê de ne pişgirîya xwe diyar kir û ji berxwedana wan re serfirazî xwest.

Li gel 11 rîexistînen Kurd, Yekîtiya-Çep, TKP-B, TUDEH, Fedaiyên Xelk-Pirranî, Cepha Demokratîk a Filistîn, Cepha Gelê Filistîn (Sempatîzan) û Komîta Aşîti Dûmahîk r.6

Parlementerê Alman Gert Walter: "Heya pirsa Kurdan neyê helkirin têkiliyên Tirkîye û Yekîtiya Ewrûpa normal nabin"

Di 27.02.1987'an de li bajarê Lübecke (Almanya Federal) berpirsiyaren KKDK ji Gerd Walter re daxwazên xwe, yên ku ew ji bo Kurda ji hukumeta Almanya Federal dixwazin, vekirin. Gotin, di-ve ku hukumeta Almanya ev heqen dane biyanîyên din (Yunanen, Tirkan, Portekîzan û hwd.), bide Kurden li

da ya azadîxwaz dûr û dirêj agahdarî da Gerd Walter.

Berpirsiyaren KKDK ji Gerd Walter re daxwazên xwe, yên ku ew ji bo Kurda ji hukumeta Almanya Federal dixwazin, vekirin. Gotin, di-ve ku hukumeta Almanya ev heqen dane biyanîyên din (Yunanen, Tirkan, Portekîzan û hwd.), bide Kurden li


Di meha buhurî de civîna Yekîtiya Çep ya bilind a sala 1987'a çêbû. Di civînê de xe-baten bûyi û ber çav re hatin derbaskirin û ji bo xebatên rojén pêş gelek bîyîr hatin standin. Piştî civînê jî belav-

kek hate belavkirin.

Belavok, rewşa dinê, ya mintiqê, Tirkîye û Kurdistanê dide xuyakirin. Belavok, politika Tirkîye ya şerwaz û nokeriya empe ryalîzma DAY radixe berçava. Li ser kampanya li dij-Bulgar û da-

dûmahîk r.7

Li herêma Şirnaqê şerekî dijwar Piştî du roj liberxwedanek bi qehramanî Yusuf Bayram şehîd ket



tin kuştin û çend heb jî birîndar bûn. Lê hezar heyf, welatparêzê hêja, Yusuf Bayram jî di vî şerî de şehîd ket.

Cûnta faşist û rojnamen Tirkîye û Kurdistana Iraqê û Kurdistanê hûr disekine; guhertinê dibin, rewşa jiyanê xelkê, işkenece-zilma dibe û h.w.d. Di belavokê de li ser Tirkîye û Kurdistanê wisa tê gotin:

"Li Tirkîye buhrana aborî her dije kûr dibe. Enflasyon ji nuh ve ber bi jor hildikse deynê derive cara yekemîn ji 30 milyar dollarî derbas dibe. Ferqa di navbera zengîn û xelkê de bi lez fireh

dûmahîk r.7

Li ser vê bûyerê KUK-Baskên Sosyalist di 26'ê Adarê de belo-vokê belav kir. Ew di vê belovo-ka xwe de li ser Y. Bayram vê agahdariyê didin;

"Ev di sala 1977'a de bi çend pêşmergên Kurden Başûr ve hate girtin û 8 meha li Anquerê di hefsê de ma. Lê piştî ku ji hefsê derket, wî bi hêzek hîn xurttir dest avêt xebata xwe..."

Sofî di êrişâ buhara 1979'a de ku leşkerên Iraqê anîbû ser meqerê Qiyada Miweqet, ew wê çaxê li Kometa mîvan bû. Alîkariyek baş gîhand pêşmergan, ji wan re

Dûmahîk r.3

Destpêka jiyana rojnamegêri li Kurdistanê

M. Elî

Îsal di 22'ê Nisanê de, 89 sal dibe ku hejmara yekê ya rojnama pêşin a Kurdî "Kurdistan" derketiye. Rojnama pêşin a Kurdî di 22'ê Nisana 1898'a de li derveyî Kurdistanê li Qahîrê di jiyana penaberiyê (multeciyê) de çavê xwe vekir.

Vê rojnamê her ci li derveyî welat dest bi weşanê kir, li nav welat jî dihat belavkirin û bi avabûn, naverok û armançê xwe rojnama milî ya pêşin bû. Loma, îro di nav Kurdistan de û bi taybeti jî li Kurdistan Başûr roja derketina hejmara wê ya yekê, wek Cejna Rojnamegeriya Kurdi tê qebûlkirin û pirozkirin.

Lê gava em bala xwe bidinê, tê xuyakirin ku jiyana rojnamegeriyê, avabûna çapxanan û kar û barêna çap û weşanê li Kurdistanê hê gelek salan berî rojnama "Kurdistan" destpêkiriye. Ev çapxane û rojnamen ku li kurdistanê hatine danîn, piraniya wan yên hukumeta Împaratoriya Osmanî ne û resmî ne, ku jî bo "wila-yeten împaratoriye" derdiketin û kar dikirin. Rojname û çapxanen resmî, ne tenê li wilayetên Kurdistanê li wilayetên din ên bin destê Împaratoriye jî hebûn. Ev rojname û çapxane ji bo wan welatan ne xwedan karekterekî milî bûne jî, tesîrek girîng li ser jiyana welat hiştine û heta hin weletan Rojhilata Navîn ew wek destpêka rojnamegeriya weletan xwe qebûl kirine. Wek misal li Iraqê rojnama wilayeta Bexdayê ya bi navê "Al-Zevraa" ku di 1869'a de dest bi weşanê kir, destpêka rojnamegeriya Iraqê qebûl dibe. Iraqî, vê rojnamê rojnamek milî qebûl dîkin û roja derketina hejmara wê ya pêşin wek Cejna Rojnamegeriya Iraqê pîroz dîkin.

* * *

Tîştekî ku em dizanin civaka Kurd, hê di salen 30'î ên sed-sala 19'an de bi awakî fireh pêrgiyê rojnamê bûye. Di sala 1832'ya de, dest bi çapkirina nusxa Farisi ya rojnama resmî ya hukumeta Împaratoriya Osmanî; "Takvîm-i Vakayî" jî bû. Her di wê salê de dest pê bû, ev nusxa Farisi li bajaren wek Bexdayê, Erzurumê, Qarsê, Wanê, Bayezidê hat belavkirin. Walî ü muteserifîn li Kurdistanê,

her wiha rojnamê li nav eşîrên Kurdistan belav dikirin (1). Nusxa Farisiya vê rojnamê her çigas kêmâsi heta sala 1837'a hatiye çapkirin û misêwa li Kurdistanê belavbûye jî, wek destpêka jiyana rojnamegeriya li Kurdistanê nayê hesabkirin, cûnkı rojname li Îstenbolê dihat çapkirin. Avabûna çapxanen û çapkirina rojnamen li Kurdistanê pişti îflankirina Tanzimatê destpêkiriye. Wek tê zanîn îlana Tanzimatê, di Împaratoriya Osmanî de destpêka reforman hesab dibe. Ji sedemân refomên Împaratoriye, yek jê jî ew bû ku Împaratoriye dixwest hukum û serdestiya merkeza Împaratoriye li ser hemû welatên bin destê

caqa Wanê û ji sancaqa Hekariyê pêk dihat) wilayeta Diyarbekirê (ji sancaqa Diyarbekir, sancaqa Mêrdîn, sancaqa Sêrtê, sancaqa Melletiyê pêk dihat), wilayeta Mamuret-ul Azîz (ji sancaqa Mamuret-ul Azîz û ji sancaqa Madena Erxeniyê pêk dihat), wilayeta Sêwasê (ji sancaqa Sêwasê û du sancaqen Anatadolê pêk dihat), sancaqen Meraş û Urfayê ketibûn nav wilayeta Helebê. Sancaqen Mûsilî û Silêmaniye jî ketibûn nav hidûdê wilayeta Bexdayê.

Lê paşê hin guhertin di van wilayet û sancaqan de çêbûn. Her wekî pişti sala 1880'yi wilayeta Mûsilî çêbû û ji sancaqen Mûsilî, Kerkükê û Si-

guherî bû "Erzurum" (4) Li Diyarbekir, rojnama pêşin di 3'ye Tebaxa 1869'a de bi navê "Diyarbekir" derket, ku "rojnama resmî ya wilayet" bû. Ji heftê carakê derket. Di salen pêşî de, rewşa etnikî ya herêmî di rûpelên rojnamê de derdiket berçav. Hin hejmaren wê bi Tirkî lê bi tipen Ermenî derdiketin, hin hejmaren wê jî bi zimanê Erebî çap bûne (5). Em nizanin gelo bi Kurdi jî nivîs tê de çap bûne yan na, lê di rûpelên xwe de cih daye buyer û rûdanê herêmî yê wê demê.

Rojnama "Diyarbekir" heta sala 1931'ê rewşa xwe ya resmî domandiyê, lê pişti vê salê ketiye bin milkiyeta şexsan û

heta sala 1963'ya derdiket. Pişti 1931'ê bûye rojnamek rojane û rojîn şemîya ne têde, her heftê şes hejmaretine (6)

Li Mamuret-ul Azîz (Elezîz-Xarpêt) cara pêşin çapxane di sala 1866'a de ji bal şexsekî ve, ku navê


wî Mustefazade Riza Efendi ye, hat danîn. Di vê çapxanê de cara pêşin kitêba Emer Naîmî Efendi ya bi navê Manzume-i Naîmîye çap bû. Paşiyê, Walî Heci Hesen Reşîk Beg, di sala 1883'ya de, çapxana resmî ya wilayetê danî û rojnama bi navê "Mamuret-ul Azîz" hat weşandin. Sernivîskarên vê rojnamê, kesen wek Sulêman Faîk, ji şairên Xarpêt Heci Xeyrî, Heci Kerîm, Elî Heyder û Osman Remzî bûn. Rojnamê heta sala 1926'a jiyana xwe domand (7).

Sala 1878'a Walîyê Sêwasê, El Hac Ahmed İzzet Paşa li Sêwasê "Çapxana Wilayetê" danî, her di wê salê de rojnama wilayetê ya bi navê "Sîwas" dest bi weşanê kir (8).

Li Entabê (Gaziantep) çapxana pêşin 1832'ya hat danîn.

Rojnama pêşin jî, sala

Dûmahîk r.7



Sernivîsa rojnama Diyarbekir ku 3'ye Tebaxa 1869'an dest bi weşanê kir.

dewletê xurt bike, rî li ber teverên rizgarîxwaz ên milîten bin destê Împaratoriye bigre, di riya bac û serane û hin hatinê din re talan û kedixwiriyê zêdetir bike. Di çarçeva van reforman de di 7'ê Çirîya Pasîn a 1864'a de nîzamnamek hat derxistin ku bi vê di nav hidûdê Împaratoriye de sîstema eyaletan hat rakirin û di şûnê de sîstema wilayetan hat danîn û idarâ wilayetan raste rast bi hukumeta merkezi ve hişk hat gîrîdan. Li gor vê, sîstema idarî ya Kurdistanê jî hat perçekirin û bi çend wilayetan hat parvekirin.

Pişti vê, di sala 1877'a de rewşa idarî ya Kurdistanê ev bû: Wilayeta Erzurumê (ji sancaqa Erzurumê, sancaqa Erzincanê, sancaqa Bayezidê, sancaqa Çıldırê, sancaqa Qersê ku di 1878'a de ket des-tê Rûsyâ û sancaqa Mûsê pêk dihat), wilayeta Wanê (ji san-

dikin, li hember kampan-ye wiha nasekinin?

Rehîme Almanya Federal

Gotinêni Erebî

Di destpêkê de silavên germ û baweriye bilind diyarî we dikim.

Ez wek xwendevanekî Armancê yê her tim vê na-ma xwe ya pêşî ji we re dişinim; hêviya min ewe ku rojnama Armanc ya hêja jiyanek dûr û dirêj li gel xwendevanê xwe derbas bike.

Hevalên hêja, ya ku ez di-bînim di nav rûpelên Ar-mancê de, di gotarêni nivîskarêni Armancê de gele

gotinêni (peyv) Erebî têne xebitandin. Wek gotina "cebha..., esker, însan..." Di dêlî van de gelek gotinêni Kurdî yên xuyayı he-ne; hêviya min ewe eku hûn guhê xwe bidin vî tiştî.

Her wisa jî, bi dil û can û bi hêviye mezin cejna we ya 21'ê Adarê pîroz dikim. Ev roja ku bi vekirina külîl û çîçekên buharê re serxwebûn û azadiya gelê Kurd aniye û heya niha gund û bajar, çol û çiyayê Kurdistanê pê hatiye xemîlandin. Xort, keç, kal û zaro kom dibin, bi hêviya Newrozek nuh ji bo serxwebûn û azadiye kêfxweşiyê dikim. Sipasiyê we dikim.

A.G.Têldar Sofya-Bulgaristan

Lok e yan arwane ye

Lawikê Berrîvanî

Di dema pêşveçûna İslamiyetê de di nav Ereba de kirîn û firotinê, bazirganiyê di warê aborî de rolekî pirr mezin dilist. Ü ji bona birin û anîna tişa jî deve pirr muhîm û bi qîmet bûn. Rojekê Erebî ji Kufê (Ku wê çaxê Elî jî li Kufê rûdîniñ) hînik tiş-mıştî firotinê li devê xwe dike û dihere Şamê. Li Şamê cîma Erebî Şamî li devê mîrik xwedî dêrnakeve, bi devê ve dibe qîrnî, dibêje:

— Kevir jî ji ezmana de bibare ev arwane (deva mî) a min e...

Rebenê Erebî Kufeyî dibêje:

— Çawa dibe, carê ev deve ji torimtiya xwe hetanî nuha li ber mala min mezîn bûye jî vê de ji bikeve, ev deve ne ne arwaneye, lok e; yanî ne mî ye, nîr e...

Yê Şamî jî bêî ku xwe bişîne, dibêje:

— Na, ev arwane a min e...

“A min e, ne a te ye”. Bi vî hawî gelekî di ber hev didin û dawîya dawîyê mesele dihere digîje Muawiye. Wê demê navbera Kufê û Şamî jî dijiminatibûye ji hev ra gulla diheli-nin û her du alî jî di hazırlîya herbê de bûne. Ji ber vê yekê jî mesele pirr tê mezinkirin. Dibêjin Muawiye li hember ci-mactek gelek mezin dest bi dawê dike. Her kes bê sebr e; meraq dike, ji xwe re dibêje, gelo wê dawî ci be, kî yê bibe xwedîyê devê?

Muawiye bi dengê hêli ji mîrikê Şamî dipirse:

— Ev arwane (deva mî) a kê ye?

Ê Şamî tavîlî bersîvî dide:

— Ev arvane a min e.

Muawiye hema di cî de biryara xwe eşkere dike:

— Ev arwane a Şamî ye.

Ü pişti vê biryara xwe îcar vedigere ser cimatê, ji cimatê dipirse:

— Ya cimaet! Ev arwane a kê ye?

Cimaet jî bi yek dengî gotiye:

— Arwane a mîrikê Şamî ye.

Bi vî hawî mîrikê Şamî li ciyê rehetiyê dibe xwedîyê devê. Lê xwedîyê devê, mîrikê Kufeyî jî ji xwe re mit û mat dimîne; nizane ka ci bîbêje! Di vê nabînê de Muawiye mîrikê Kufeyî xewle dike, jê re dibê:

— Li min mîze, ez jî zanîm û tu jî zanî ku deve ne arwane ye, lok e û devê te ye... Nuha, çaxa tu vegeryayî Kufê ev tiş-tê ku te li vir dît here yek bi yek ji Elî re qal bike û bîbêje: Deh hezar peyayî Muawiye yên ku deva nîr û mî (arwanê û lok) ji hev nâgerînin hene.

★

Di van 6-7 salen dawî de hin bûyerên wer cê bûn ku cîmata Muawiye tîne bîra meriv. Gelek lawê bavan (Hûn cîmata bîxwînîn) rabûn ji sipî re gotin reş, ji reş re gotin sipî; ji çewt re gotin rast, ji rast re gotin çewt; ji baş re gotin xerab; ji xerab re gotin baş. Rojekê bûn dosten hin rîexistinan, roja din pê re bûn dujumunê qanî -qanê; rojekê pesnê hin kesan, hin rîexistinan dan, roja din anîn du quruş û nîva, xistin binê erdê. Welhasil, çaxa rîber û serokê wan ji lokê cîdanî re got:

— Viya ne lok e, arwane ye..

Wan jî wek "cîmata" Muawiye li "serok" vegeryandin:

— Eşhedübilla, tu rast dibêji; ev ne lok e, arwane ye...

Vê lîstikê wîsa dom kir; ge lok bû arwane û ge jî arwane bû lok. Lê tişte nehat guherandin, "cîmactê" her tim serî leqand...

★

Car-carna ew kesen ku li vê yekê varqilîn, ne bes "cîmat" terikandin, bi carê de "zîkir û ibadet" jî berdan; wek lokê hêc, hîc bûn û bi çolê ketin...

Bê guman çawa ku mîna "cîmata Muawiye" ji her gotina "rîber" û "serok" re belê gotin ne rast e, her wîsa bi carê de dev ji "zîkir û ibadet" berdan jî ne rast e; ne tu rî ye. Ev rî pirr pirr wê meriv ji iîmanê bike...

Îcar hetanî ku em fîr nebîn bi aqîlê xwe jî bifikirin, em ci navî li xwe dikin lê kin, emê her û her wek "cîmata Muawiye" bîmînîn. Ne kêm û ne jî zêde...

• UZIR •

Di hejmara me ya berî de gelek çewtiyîn çapê cê bûne. Lê ji vana cend heb, cumle ketine û qismek gotarê nayê fîmkirin. Em wan li jêrê rast dikin, ji niviskarêni gotaran û ji xwendevanê xwe uzirê xwe dixwazin.

I- Di nivîsa "Cunta faşist Ednan Tûsuz kuş" de (r.8, stûn 2) paragrafa duðuya diwê ew bûna:

“Wek pîreka wî dibêje, pişti Ednan tê mal û meselî dibîhize, lê dixe dihe-re qareqolê. Li gor beyana Suphan pişti işkenc 3 rojan hat kuştin.”

2- Di gotara Zinar Şiro ya ku bi navê “Netwepêwer û xebatkarê Kurd Fehmiyê Lic” di rûpela 4'a de belav bû, stûna 4'a de paragrafek nehatîye nivîsin. Ew paragrafek nehatîye nivîsin bi paragrafek beriya wê re em ji nû ve dinivîsin:

“Gere min ev pirs ji te nebîhista. Lê tê xuyakirin, ku tu jî bi derewen dijin hatiyî xapandin.

- Apo ez ne jî devê dijîmîn dibêjîm. Ev gotin di nav gel de tê gotin û tewr Partiya Komünîsta Türk jî dibêje.”

3- Di gotara Sabîha ya ku bi navê “8'ê Adarê û vatinîyên jînîn Kurd” di rûpela 7'an de, di paragrafa 13 û 14'an de hin cumle ketine. Em bi wan cumlê ketine ve paragrafan ji nuh ve dinivîsin;

“En ku 130 sal berî ेrîs birin ser jînîn Amerika û di kolanîn New-York’ê de ew gulebaran û pêşengên wan qetîlkirin senekirin tevgera jînîn rawestîn. Faşizma Musolînî û Hitler jî senekir rawestîne. Di dawîya vê sedsala me de, generalen Türk, ên faşist ji bi cezayen xwe yén barbar nikarin tevgera jînîn Kurd rawestîn.

Ku tevgera jînîn a navnatewî xurttir bibe, çewa ku, bi alîkariya jînîn faşizma Musolînî û Hitler hate pelciqandin, wê generalen Türk, genera-lîn...”

★Namên gihaştî★

Rizzgar Alasor-Staven-ger/Norveç, Salih ji Böchümê-Almanya, Mahmûd û Şuayîp-Fransa, jî Irâne name

PÊŞNÎYARA YEKÎTIYA SOVYET RIYA ASTIYÊ VEDIKE


Ji şerê cîhanê ye yekemîn û vir de tim û tim hêzên astixwaz, bi taybetî Yekîtiya Sovyet û welatên sosyalist, ji bo afîrandina astiyê insiyatif girtine. Hêzên astixwaz bi awakî tekûz pêşniyar û daxwazen xwe parastinê, ji bo jiyanekî ji bombeyen atomî azadkirî xebat kirine û vê xebata xwe ya hêja iro jî didomînin. Eger mirov hinek paşde here, peymânîn SALT-1 û SALT-2 di dîrokê de rolek girîng leyîstin. Pişt re peymana ABM hat û di munaqeşa astiyê de merhalek nû vekir. Lî belê welatên emperyalist wek DAY, Fransa û Brîtanya tim û tim hewl dane xwe ku van peymanan sabote bikin. Ew ji bo nebiciâna van peymanan, gavê avêtî pûc dikin. Proja SDI yek ji wan e.

Civîna Rejkyavîk cardin bi insiyatîfa hêzên astixwaza pêk hat. Civîna R. Reagan û M. Gorbaçov di munaqeşa astiyê de gavek girîng bû.

M. Gorbaçov di meha Çileya Paşîn a sala 1986'an de programek pêşkêş kir. Di vê programê de armanc, heyâ salâ 2000'an ji holê rakirina bomben atomî bû. Welatên Warşowayê par li Budapeştey civînek çekirin û di vê civînê de ji bo NATO pêşniyara kêmkirina leşkerî û fûzeyen atomî anîn. Lî belê NATO guh neda vê pêşniyarê jî.

Di despêka meha Adarê de, Yekîtiya Sovyet pêşniyarek nû anî. Li gor vê pêşniyarê ji holê rakirina fûzeyen atomî yên ku li Ewrûpayê hatine bi cî kirin, hêsanter dibe. Yekîtiya Sovyet wê yeko yeko bi welatên xwedî fûzeyen atomî re rûnê û bi wan re peymanan îmze bike.

Dewletên Amerika Yekbûyi, Fransa û Brîtanya xêrhatina xwe ji bo vê pêşniyarekî kirin. Niha komîsyonê her du weletan -Yekîtiya Sovyet ve DAY- hazırlıya ûmzikirina peymanek girîng dikin. Eger YS û DAY li hev bikin wê Ewrûpa ji fûzeyen atomî (yên bi nîvmenzîl) pa-



qij be.

Li vir mirov dikare vê pirsê bike; "Gelo Yekîtiya Sovyet çima ev pêşniyar anî ?" Spartak Beglov (pisporêkî Sovyetî ye) wiha bersiv di-de; "A yekemîn armanc ew e ku xwînek nû bide munaqeşa çekdaxistinê û bend li ber windabûna hêviyên civîna Reykyavikê bigre. Herkes dizane ku li Ewrûpayê û nemaze li Washingtonê hin hêzên taybetî bi avayî dixwazin neticeyên civîna Reykyavikê pûc derxin û daxwaza wan ew e ku ev civîn bi tevayî bête ji bîrkirin. Bi vê pêşniyarê hew dikarin pêşniyara Sovyetê ya "Helkirina tevayî" ji xwe re bi-

kin sebeb û munaqeşa çekdaxistinê sabote bikin.

A duemîn tevgera nûkîrîna civaka Sovyetî ye. Ev tevgera hêj nû dest pê kîriye hewcedariya xwe bi astiyê heye. Divê rewşa navnetewî bêtir nerm bibe.

A sêmemîn jî ev e ku hukumeta Sovyetê bi vê pêşniyarê nîşan dide ku ji bo guhdarîkirina hemû bîr û bawerîyan -ci li welet û ci ji derveyî welêt- amade ye. Civîna Nawnetewî ya li Moskovayê "Ji bo Dinyake ji Bomben Atomî Azadkirî û ji bo Jiyana Însan" vê yekê ispat kir"

10.000 Afganî Çek berdan

Wek tê zanîn hukumeta Afganîstanê di 15'ê Çileya Paşîn a 1987'an de afûyek ilan kiri-bû. Hukumeta Afganîstanê ji bo birêvebirina programa afûyê komîsyonek damezrand. Watiniya vê komîsyonê haziriya tendurîstî, cîwarkirin, hîndekarî û birêvebirina afûyê ye.

Kesên ku sîxurî (ajanî) kiri-ne, sabotajen bi bombe pêkanîne û di tevgerên terorîstî de cî girtine nayen afû kirin.

Ji vê biryarek bi vir de heyâ niha 10.000 Afganî çek berdanê û teslimî hukumetê bûne. 25.000 muhacirên Afganî

Li Amerîka intîxar roj bi roj zêde dibe Gelo sebeb çiye?

Di van salêن dawî de li Amerîka intîxara (xwekeştin) di nav xor-tan de bi hawakî dramatîf zêde bûye. Bi taybetî jî di nava xor-tan 15 û 19 salî de geleki pêş de çûye. Ü ev yek ji geleki milet ditirsinê.

Di 12'ê Adarê de li Bergenfield, New Jersey 4 xort; 2 keçikên xwehênen hev û di lawîken hevalînen wan bi hev re intîxar kirin. Sebebî intîxarê wek pîrrê cara: problema alkolizmê, problema afyonkêşiyê û problema qewitan-dina ja mal û ji dibisstanê.

"Yanî gişa ji ji istîkbâle, ji rojén pêş û ji cîhanê hêviyên xwe birri bûn."

Vê bûyerê tesvîrek pirr mezin li gelê bajarê Bergenfield (nîfusa bajer; 250.000 e) kir. Tesîr, ne

bes ji ber vê bûyerê bû; di nav çar mehîn dawî de 4 hevalînen wan ên din ji xwe kuştibûn.

Hat tespîtkirin ku her çarê wan ji serxwes bûne. Ü dibêjin bi ih-timalek mezin wê evên dawî ji pişti serxwesiyê xwe kuştibin.

Her çarän ji bi gaza karbon dîoksît di texsiyekê de xwe Jahr da-dayî kiribûn û nama ku bi hev re nîvisandibûn di texsiyê de hiştibûn; di nama xwe de daxwaz kiribûn ku bira her çar bi hev re bîn gorkirin.

Sala 1973'a jimara intîxaraji her 100.000 kesî de navbera 15 û 1' salî 6,9 bû, pişti deh sala ev jîmar derketiye 8,7%.

Newroz hate pîrozkirin

Destpêk r.1

"Ji bo êrîşen har ên mîtingehkaran ku ji emperyalîzmê piş distîne bîn daftan û serdestiya wan a li welatê me bê şikestin û ji bo gelê me bigîhîje serxwebûn û azadiya xwe, yekîtiyek zexm û emirdirêj ku ji hemû hêzên demokratik û netewî pêk bê pêwist e. Gelê me bi saya têkoşinek yekîti, rejîma Dehaq hilweşand. Belavbûna me ku di vê

AGIRÊ NEWROZÊ BILIDKIN

NEVROZ ATEŞINI YÜKSELTİLM

P.P.K.K.



Yek ji pûlênu ku li welat bi dîwaren ve hatiye zeliqandin

nevrozo îsal de jî dom dike, wezîfeya herî acil; bi bilindkirina şîara 'Bi hev re hêz pêk tê' ji bo yekîtiyek hêzên rizgarîxwaz ên netewî di praktîkê de gav avêtin e.

Newroz li Kurdistana Suriyê ji bi girseyî hate pîrozkirin. Hemû hêzên Kurd bi hev re li her gund, bajar û dêwerîn Kurd lê dijîn hate pîrozkirin. Di gel tehdît û gulebarandina hukumeta Tirk.

Li Ewrûpa Newroz wek her sal di salona de bi programê muzîk, stran, tiyat-ro, folklor û h.w.d. hate pîrozkirin. Apociyan îsal bi êrîşê xwe dixwestin Newroz neyê pîrozkirin. Lî ji bîr dikin ku ev gelê qehreman, di şertîn ku dewletên mîtingehkar bi ordiya xwe li hember disechine, cardin Newroza pîroz dike, wê li hember êrîşa çend Apociyan Newrozê pîroz neke!!!

Newroz li Holandayê; Deventer, Denhaag, Zondamm, Li Almanya Rojava; Münchén, Hamburg, Bremen, Berlin, Köln (2 şev), h.w.d. li Swêdê; Stockholm, Göteborg, Uppsala, Sundsvall, Eskilstuna, li Yewnanîstanê 2 şev, li Danîmarkayê şevez hat pîrozkirin. Bêî van li gelek ciyên din ji Newroz hate pîrozkirin.

MIREKA



Swêd û bazirganiya çek

H. Mizgin

Van rojen dawî li Swêdê skandal li pey skandalê dertê û bi rastî mirov bixwaze nexwaze deztpêdike hin pîrsan ji xwe dipirse. Ma gelo Swêd bi rastî jî dostê mileten bindest e? Ma gelo gotin û tevgera hukumeta Swêdê li hev tê?

Bi rastî dema dema mirov li hin bûyeran dinêra, dibîne ku Swêd welatek "piçûk" e, lî belê di bazara dinê de ci-yek girîng distîne. Dewleta Swêdê siyasetek wisa bi rê ve dibe ku mirov zû bi zû xeterêvê siyasetê nabîne.

Hemû hêzên astixwaz û demokrat li dîj dewleta Afrika Başûr derketin û têkoşîna xwe didomînin. Di nav wan de Swêd bixwe jî hebû. Lî belê Swêd heya iro tu gavek pratîk ne avetiye. Belê hukumeta Swêdê bi mîlyonan alî-kariya ANC kir, lî ji aliyê din şirketê Swêdî ku li Afrika Başûr kar dikin, mîlyaran dixin kîsîn xwe û bi hebûna xwe jî jiyanâ rejîma nijadperest (Apartheid) dirêj dikin. Wê dawiyê biryara boyotkirina Afrika Başûr hante stendin lî belê heya iro di vê rê de tu gav nehatiye aveti.

Swêd di bazirganiya çêkan de jî bi nav û deng e. Yek ji skandalen ku dewleta Swêdê hejand, bazirganiya çêkan e. Li gor qanûnên Swêdê tu şirketê Swêdî nikarin çek bifroşin welatên ku di nav şer de ne. Lî belê di welatên emperyalist de qanûn bi kaxizê de mane. Dewleta Swêd ji dewletek emperyalist e, li her aliyê dinê xwedî bazar e.

Bofors, fabrikayek bi nav û deng e. Çekên ku Bofors çedîke ji ber sivik bûn û pratîkbûna xwe pir zû bazarê dibîne. Lî belê şirketa Bofors ji bo ku mîlyaran bixe kîsî xwe li dij qanûnân çekan firotiye û difroşe welatên ku di nav şer de ne. Helbet dema Bofors vî karê dike bi destura karbidestan dike. İcar di vir de mirov dibîne ku tevger û gotina hukumeta Swêdê ne wek hev in.

Bofors di navbera 1979-1985'an de 1,2 mîlyarî çek firotiye Sîngapûrê. Li gor hin dokumanen ku di masmedya de eşkere bûn, li Sîngapûrê bi lisansa Boforsê Robot-70 tên çekirin û ji vir ji ji welatên din re tên bi rê kirin. Di havina 1985'an de 200 Robot-70 gihiştine İranê. 22 to-pen hewayî ji Taylandê re hatine şandin.

Di sala 1986'an de Dewleten Amerika Yekbûyi bi mîlyaran sîparîsa çêkan kir. DAY vê wan çekan ji Honduras, Guatema-la û bi taybetî ji Kontra re bi rêke. Dîsa par bi hezaran ton barûd di ser şandinê de hate rawestandin. Barût jî İranê re bû. Pişti rawestandinâ vê barûd eşkere bû ku Swêd ji destpêka şerî İran û Iraqê çek difroşê İranê. Li gor pilotek İranê, Resûl ku ji İranê reviyaye, sala 1985'an bi teyarê 1200 ton çek ji Swêdê çûne İranê û ji bo vî karâjî ji balafirgehén Frankfurt, Londra, Amsterdam, Paris, Dubaî û Sîngapûrê hatine bikaranîn.

Belê wek me li jor jî got di vê teyar û gotin li hev bîn. Swêd wek welatek astixwaz tê nas kirin. Bi Komîsyona Palme û bi Olof Palme bi xwe ji bo astiyê dinê pirr tiş hatine kirin. Divê wan kar û barên hêja bi menfeeta monopolen giregir neyên qirêj kirin.

Hukumet dixwaze pêrgiyê li xerîba bigre

Li İswîreyê di 1'ê Nisanê de du dengdan di nav gel de çedîbe. Dengdan, yek ji bo politika li hember xerîba ye û ya din jî di derheq tesîr û maflû mudaxela gel ya li ser parastina welet e. Gel dixwaze ku qanûna parastina welet bêtir maflû heqê gotinê bide wan. Ün kes û hêz li dijî vê yekê ne.

Hukumet dixwaze ku siyaseta xwe li hember multeciyê siyasi bêtir bijidîne û bi alîkariya hin qanûnân pêrgiyê li xerîba bigre ku wek fro nikarîn maflû îltîcâye bigrin. Li gor beyanen daîren resmî her meh 1000 kesen xerîb îltîcâye İswîreyê dike.

Her çiqasî tevgerek protestoyê li dijî vê pêşniyare heye ji, lê gor texmîn bi tevayî tên kirin piranîya mîlet piştgirîye pêşniyare dike. Heger ku piranî ji pêşniyare re bîbêjê Erê vê demê rewşa xerîba li gor fro geleki xirabir bibe.

Ü dengdana din ji, çaxa piranî bîbêjê erê, wê maflû mîlet hebe ku daxwaza butçuk nuh ji bo parastina welet bibe.

Li herêma Şirnaqê şerekî dijwar

Destpêk r.1

fişek cebilxane kişand cihê şer. Çaxa birîndar bû jî di destê wî de du sindoqên fişekan hebû; bi birîndariya xwe ve ji tehtê hate xwarê, li sindoqên fişekan ber nedan heta ku gîhand pêşmegan. Ew bû rîberêkî giranbiha yê pêşmerga û şoresgeran. Ew di gelek deravên teng re derbas bû, lê hemû caran jî xwe û hevalîn xwe û emaneten şoresê bi serfirazî û bi mîrxasî ji van tengasiyan xilaskir.

Li gor ku xeberên ji herêmê tê, cûnta faşist leşkerekî giran kişandiye herêmê û ji wê herêma ku şer lê derketiye bi sedan kes, bi qîç û pîlên wan ve girtine. Ü li alî din jî gelek gündî ji tırsa, gündê xwe berdane ûçola ketine.



NETEWEWERWÊR Û XEBATKARÊ KURD FEHMIYÊ LICÎ (2)

Zinar ŞîRO

Hê ku şoress neteqiya bû, Şêx Seidê nemir di haziriya şoreşê da bû. Şevekê li Korxayê di mala Evidisemed da di waza xwe da bi kurtî weha di got: "Mirov ku ne neteweperwer û welatevîn be, mirov nikare tu olekê jî bihewîne û ciyê mirovê xwe nenas di tu olekê da jî tuneye. Û xwedê olê li kesen azad ferman kiriye." Van gotinê xwe ku bi ayet û hedîsan dinumand û paşê jî weha digot: "Milet dîwar e, dîn sîwax e", yanî divê berê hebûna mirova neteweyî hebe paşê ol, eger hebûna mirova neteweyî tunebe ol bi kêri tu tişteki nayê.

Rast e silogan tev olî bûn. Lî ev ne tesbita Şêx Seid tenê bû, ev di 1924 an da ji aliye komela Serxwebûna Kurdistane ve hatibû tesbitkirin. Ü li gor wê demê jî ev tesbîteke rast bû. Eger silogan ne slogan olî ba ji bil çend kesen neteweperwer gelo dê Şêx Seid kariba komên gel li dora xwe bicivanda, bi tevê vê jî di programa Şêx Seid da ev hebû: Pişti girtina Diyarbekir, slogan bi tevâyî dê bîba neteweyî.

—Apo pir spas lê birastî ez bi wê pirsa xwe ne bawer bûm. Bes, mebesta min ew bû ku ez te bidim peyvandin.

Ü paşê min weha jê pîrsî:

—Apo di hin belgeyên Tirkan da tê gotin, ku komelê Serxwebûna Kurdistanê ji aliye Şêx Seid ve dihat finanse kirin û serekê komelê yê bidizi Şêx Seid bû. Ü Tirkan ev ji Yusif Ziya Begê bihîstine, dema Yusif Ziya hatiye girtin, li xwe mukur hatiye û her tişti gotiye.

—Tu rast dibêjî, min jî ev xwendibû. Lî Tirk li Yusif Ziya Begê derew dikin. Di baweriya min da jî di baweriya Şêx Seid da jî ev mesele ji aliye Tirkan ve bi qestî hatiye vajikirin.

Çend roj pişti destpêkirina şoreşê me civînek çêkir, me hereketê xwe hêjand, pişti kutabûna civînê min ji Şêx Seid pîrsî:

Gelo Şêx efendî ji gotina di derheqê Yusif Ziya Begê ra çi dibêjî?

Sê roj paşê bi tesfiqa Şêx Elî Rîza Wedatê Suleylaniyeyî ev pêşniyaz bir civîna Komela Pêşketina Kurdistanê ya mezin. Her çend di civînê da ev pêşniyaz ji aliye hin kesan ve xasma ji aliye xortan ve bi germin hat parastin jî dîsa ji aliye Seyit Evidilqadir ve ne hat qebûl kîrin.

Kor Huseyin Paşa jî di bersîva xwe da weha gotibû:

Miletê Kurd mîletekî mîr-

xas e. İro Tirk di rewşek weza

û keticî da ne, ji şanî mîrxaşıya

Kurd ra dest nade ku di rew-

şek weha da erîs bibe ser Tir-

di dawiyê da ez gîhîstim vê encamê, ku ev ne ifâda Yusif Ziya Begê ye, lewra ev tiştên ku hatine gotin ji wan gelek tiştên din jî hebûn û tev jî di zanîna Yusif Ziya Begê da bûn. Lî tiştek ji wan nehatiye gotin. Dibe ku ev ji aliye Hecî Musa Begê ve hatiye gotin. Lewra Hecî Musa Beg pê dizanibû ku ji bo mezaxtinê (mesrefen) komelê ci pere lazim ba Yusif Ziya Begê dihat ji min digirt, dibir.

Rojtira dî, min dîsa jê pîrsî.

Apo min pîrsa pêşniyaza ku te ji Seyit Evidilqadir ra bîribû û civîna ku te li Vartoyê çêkiribû ji te kiribû. Ez dîsa ji te tika dikim tu ci dibêjî?

—Min dixwest dema ez bîranînen xwe bi tevâyî ji te ra bibêjîm ez van meselan jî dûr û dirêj izah bîkim. Lî evê ku ji te ra wer bûye meraq ezê bi kurtî bibêjîm:

Bi kurtî gotinê Apê Fehmî ev bûn:

Gotinê ku Ehmed Begê Cibrî ji te ra gotibû rast e. Lî ev pêşniyaz ne tenê ji Seyit Evidilqadir ra ji Xalid Begê û Kor Huseyin Paşa ra jî hatibû hinartin.

Pişti Şoreşa Oktoperê, lesskeren Rûs ên ku Kurdistanê dagirtibûn hêdî hêdî şûnda vedikişîyan. Şêx Seid ev yek ji rizgarkirina Kurdistanê ra keys û fîrsendek mezin didît. Ji ber vê yekê şand pey min, min û Şêx Elîrîza pêşniyaz ji Seyit Evidilqadir ra bir İstanbul. Lî mixabin Seyit Evidilqadir qebûl nekir û weha got: Kurd mîletek misliman û mîrxaş e. Ji dînê me û şîara me ya millî ra dest nade ku em di rojek weha da ku Tirk mihtacê arîkariyê ne li wan din. Maazellah eger ez tiştek weha qebûl bikim dê hestiyê bavê min di gorê da ezap bîkişîne.

Ew ji bil karê sekreteriyê di eniyên ser da jî mîrxaşekî bê hempa û yekta bû.

Fehmîyê Licî endamê Xoybûn bû.

Xoybûn û Taşnaqê bihevûdu ra naşeya Kurdistanê û Ermenîstanê xêz kiribûn. Gava Fehmîyê Licî li vê nexşeyê difekire dibîne ku Cizîra Botan ketive nav axa Ermenîstanê, û vî aliye Kurdistan Ermenîstan e. Fehmî gelek hêr dibe û di civîna Xoybûnê da bi temamê giraniya xwe li dij vê nexşeyê derdikeve, li endamê Xoybûnê yê ku di xêz-kirina nexşeyê da amade bûbû rexne dike, deng li civînê dike û weha dibêjî: Divê civîn bizane ku endamê Xoybûnê ji aliye Taşnaqê ve hatiye xapandin û ew endam jî li xwe mikû were ku hatiye xapandin û divê di kongreyê da bîryara rêsîkrîna vê nexşeyê bê girtin. Li ser vê axiftina Fehmî di navbera wî û merhûm Celadet Begê da munâqaşayek gelek sert çêdibe.

kan. Ne ku ez dibêjîm na, bila Türk hînek berxwe bibînin hê mafir em Kurd in ci dema bixwazin dikarin Tirkan ji welatê xwe biqewirînîn.

Lî heyhat!... Dema şoreşê destpêkir, agirê mîrxasiya Kor Huseyin Paşa di cî da vîmirî û xwe li ciyê xwe teland, bi telandînê jî nema serda xêla wî bi leşkeren Tirkan ra li şoreserên Kurd xistin.

—Civîna li Vartoyê jî rast e? Min ew civîn li ser daxwaza

Şêx Seid û Xalit Begê Cibrî bi serekê xêla Xiromekan, Şadiyan, Çarekan û hinêñ din re çêkir. Le mixabin Elî Heyderê ku ji te ra gotibû û hin serekên xêla Xiromekan tewr xwe Kurd jî nedidît.

Şêx Elî Rîza jî çûbû aliye Dêrîsimê, her çiqas Nûrî Dêrîsimî û yek du kesen dî bi germin pêşniyaza Şêx Elî Rîza di-parastin jî lê mixabin dîsa ji hişkaweriya mezhebî li wir jî neticeyek nehat girtin.

Fehmîyê Licî Sekreterê Şo-reşa Şêx Seid bû.

Dema Şêx Seid tê gundê Li-cê; Korxayê, dişine pey Mele Mistefa û Fehmîyê Licî.

Rojtira dî Fehmîyê Licî, Mele Mistefa, Haqi Beg û Elî Axayê Mala Hecî Usman diçin ziyereta Şêx Seid û dawetî navçeya Licî dikin. Wê şevê pişti axaftinek dirêj Fehmîyê Licî karê sekreteriya (katibi) şoreşê digire situwê xwe.

Ew ji bil karê sekreteriyê di eniyên ser da jî mîrxaşekî bê hempa û yekta bû.

Fehmîyê Licî endamê Xoybûn bû.

Xoybûn û Taşnaqê bihevûdu ra naşeya Kurdistanê û Ermenîstanê xêz kiribûn. Gava Fehmîyê Licî li vê nexşeyê difekire dibîne ku Cizîra Botan ketive nav axa Ermenîstanê, û vî aliye Kurdistan Ermenîstan e. Fehmî gelek hêr dibe û di civîna Xoybûnê da bi temamê giraniya xwe li dij vê nexşeyê derdikeve, li endamê Xoybûnê yê ku di xêz-kirina nexşeyê da amade bûbû rexne dike, deng li civînê dike û weha dibêjî: Divê civîn bizane ku endamê Xoybûnê ji aliye Taşnaqê ve hatiye xapandin û ew endam jî li xwe mikû were ku hatiye xapandin û divê di kongreyê da bîryara rêsîkrîna vê nexşeyê bê girtin. Li ser vê axiftina Fehmî di navbera wî û merhûm Celadet Begê da munâqaşayek gelek sert çêdibe.

Mifetişê Umûmîyê Tirkâ İbrahim Talî, li Diyarbekirê di rojenmeyek meheli da li ser vê civînê bi kurtî weha ni-vîsî bû:

Di Civîna Xoybûnê da ji Fehmîyê Licî

Fehmîyê Licî ku di civîna Xoybûnê da li dij nexşeyâ ku ji aliye Xoybûn û Taşnaqê ve hatibû amadekirin derdikeve û li Celadet Begê weha diqfî:

“Begê min Kurdistana di navbera du Ermenîstan da Mîna sîpiya di navbera du ni-kûkan da mehkûmê mirinê ye.”

Celadet Beg:

“Lawê min Fehmî, ê li hemberê min bipveye ne tu yi”

Fehmîyê Licî:

“Begê min rîzdarîya min ji te ra heye; lê ji bo doza Kurdistanê ne tenê li hemberê te, ez li hemberê xwedê jî derdikevin.”

Pişti vê gotina Fehmîyê Licî, pevçün derdikeve serê Fehmîyê Licî tê şikandin û civîn bela dibe.

İbrahim Talî gotinê Celadet Beg û Fehmî bi Kurdi ni-vîsibûn û wergerandibûn Tirkî.

Fehmîyê Licî, dema li Kurdistana Iraqlê bû, bi destûra İngilizan dibistan vekiribû. Li mintqa Badînan bi Kurdi dersa zarokên Kurd dida û di bin baweriya neteweperwîyê da ji şagirtên xwe ra hin çîrokan dinivîsî û di bin çîrokan da di şûna navê xwe da Mamosta dadanî.

Nîvîsinê Fehmîyê Licî:

Fehmîyê Licî gelek çîrokên hêja ni-vîsî bûn, çend çîrokên hêja ji Firansîzî vergerandibûn kurdi, ji hin çîrok û helbesten bi cûre cûre zîmanan bir wergirtibû huviyetek Kurdayeti dabû wan û ew jî nû ve ni-vîsibûn.

Bi qasê ku tê bîra min hin ji çîrokên wî ew in:

1-Kotela Kanîresê

2-Feteh Begê Kerzan -Gotina Mîrê Kerzan hêja ye ku mirov ji xwe ra bike guhar.

3-Giliyê Darên Mazî

4-Biratiya Gur û mîyê

5-İlham ji şairek Ermen

Ji-bil çîrokan hin helbesten wî jî hebûn. Lî mixabin nuha yek jî li ba min nîne.

★

Biramînên Generalektî

Tirk

Cemal Madanoğlu

-10- Wergêr : Alîşer

Ziyayê Binbaşî (sergurd) Fermanberê cendirmen bajarê Urfayê, telgrafek kişandiye Tabura me:

—Cemal Madanoğlu ê mulazim û xwediyê reqem sicila 4098 an (cendirmen reqem daye min) ku hetiye tayînkinir ji bo Mulhalika me, bi zûtirin wext bê şandin ji bo qita me...

Wexta ez çûm Taburê, min tîlgraf dît, ez geleki şâ bûm.

Min bazda û rast çûm oda Celal Yuzbaşî:

—Ez benî, ez bûme cendirme, musaeda we hebe ji bo ku ez herim daxîlî qita xwe...

Nişka ve çek ma û hêrs bû:

—Tu nîzânî ku vira serxet e, got, serxet. Kengî serbazek şandin şûna te, wê wextê tu dikarı herî.

Xwedê, rebî, de lo pişti ku min Alfonsê Fransiz xistibû ri-yek bi ser û ber, heta niha, Celal Yuzbaşî gelek ji min hezdi-kir, lê, ji nişka ve hat guherîn.

Ezê ci bikim?

Ethemê ku Taxima Tivingê Makîna teslimê min kiribû, bi tu awayî niyeta wî ya çûnê tune. Ji Suriyê ya jî Iraq e hinek tiş daye xwestin, li hêviya wan e. Diyek Ethem jî heye..

Di ser re 20-25 roj derbaz bû.

Emrekî din jî hat.

Vê carê min postê vekir, min bi xwe pêşî postê dît...

Di qerageha Fermanberî ya sinorê Urfayê de, ji bo namzeten Akadmiya Şer, qursek 15 rojî ya têgîhiştinî vê bê vekirin. Şandina serbazen ku dixwazin ji bo vê qursê...

Telgraf wihiye.

Êh, tiştek baş e, min jî ji Muglayê vir de, ji bo karmaytî daxwazek kiri bû...

Qaymeqamekî Dicîlê hebû. Xortekî baş û navê wî Fikret bû, ewî min pîroz kir:

—Dê lo, em binêrin, em dixwazin te kurmay bibînin.

Pişti vî rengê axaftinê, min got ku:

Ez çûm oda Celal ê Yuzbaşî:

—Ez benî, ez dixwazim herim kursa karmayıtyê, ezê bikevin imtihan; ez musaeda we daxwaz dikim.

Fermanber, li serî heta piyan li min nîrî:

—Li min binêre, bi te re tu şêla ku tu bikarî bîbî kurmay heye? Derkeve der...

Xwedê û rebî, ji bo cendirmetiyê naşîne, vê carê, ji bo kursa namzetiya kurmaytiyê jî naşîn e...

Dê çawa be ev karê han?

Min xwe bi xwe, di hindûrê xwe de bîryara xwe da; min nikaribû ez herim ji bo cendirmetiyê lê, ez nikarim kursa kurmaytiyê ji dest birevinim.

Di wan rojan de, eşyayê Ethemê me hatin. Ji bo ku ji Ci-zîrê here qamyonek girt.

Ez li hêviya riye kî me.

Wê wextê, di Ordîyê de karek şaş û xelet hebû...

Şuba eskeriyê eskeran digre û dişine bolukan. Di nava Koldorîyê de, ser û beriyek tê çêkirin. Şuba eskeriyê tenê zane ku esker pêşiyê çuye ku. Lî, piş re esker bi ku ve çû? Ev ne kîf e. Dê û bavîn esker, li lawen xwe digerin nabinen: name dinivîsin nama wî paş de tê, an jî bersiv nayê.

C

BI KÎJAN KURMANCIYA HEYÎ?

S. RÊWÎ

Ez dizanım, meriv nikare li ser babetekî girîng bi rû-pelekî an bi du rûpelan ya dilê xwe bibêje. Belê min jî diviya di warê naylontî an xwerûbûna peyvîn zimanê Kurdî de tiştina bibê-jim û bi helkeftina gotara A.Riza Alan "Kurmanciya naylon=Elîtê naylon" ev delîve bi dest min ket.

Bê guman gelek ta ji gotara wî diçin; mirov dikare ji gelek aliyan ve bigre û li ser bipeyive. Belê min di-vê ez li ser Kurmanciya wî ya 'naylon' û 'tewşo mewşo' bipeyivim ku bi baweriya min gelek ji me çi ji xemsarî, ci ji nezanînê be dikevin şâşıya wî ûjî nik xwe fermana naylontiya hinek peyvîn bi Kurdî didin.

Bi xwendina çîroka "Dame Hecî Ehmed û Fero" ez jî çûm Kurdistanê, belê riya min bi Diyarbekirê neket, ez çûm cîhek din. Çinku li piraniya gund û bajaren Kurdistanê -Hecî Ehmed- Xalê Ezo- Fero- û Dame - dijîn.

Tîstê ku ez tîgîhiştîm ji zimanê çîrokê pirtir nave-rok û cihê bûyera çîrokê lê derbasbûyi R. Alan birine Diyarbekirê. Ji xwe ji des-tîpêka nivîsara xwe, heta ku rastiyê ji me re dibêje ew bi xwe li Diyarbekirê ye: Di gel Mele Evdilkerîm û Kekê Osê pişî xwarina "quşbaşiyekê" "ji Balıqçılaraşî" ber bi 'Ulu Camî'ye ve dimeşin, rîve pêrgî M. Botan têñ çengilê wî digrin û bi hevre diçin qehwa biçûk ya Ulu Camî'ye li kîleka hewzê rûdînin. Çavên wî li tasa sifri-niya bi rézileke hesinî ve girêdayî dikeve, dizane rî-zil deh cara ji tasê giranti-re. Hecî Ehmed, Xalê Ezo

HEMÊ HACÎ

Arêkerdox:
Koyo Berz

Hemê Hacî şeker o
Kuftey pîrî dekeno
Fişqî herî bûyera
Pîzeyê xo vilêneno
Koyan sera geyreno
Seydê arwêşan keno
Awi di masey tepêseno
Tîrsê qiloşîran weno
Bahdo zîrtikî çê keno
Lejê dewan têra keno
Şino koşeyê di roşeno
Kiştene merdiman

paweno
Însanan miyan di
fesatey keno
Însanan vera pê dano
Bahdo qilwela waneno
Yaxer di çironikan vera
vindeno
Tizbeyê newa wû new
anceno
Xo bêkes û sofi
hesibneno
Hemê Hacî şeker o
Kuftey pîrî dekeno
Vay vera toz qileyeneno

û Faro dest bi damê dikin, ew jî li dora xwe temaşe dike. Garson çayê tîne... Zilamek li ser pişta şewqa xwe darikê titinê di-vewjêre...

Ji wê kurteçîrokê jî baş xuyaye ku berî xwendina çîrokê Riza Alan li Diyarbekirê jiyaye û "timîhatî" yê qehwa biçûk bûye. Belê bêyî ku bîra van bibe û bêyî ku, ji aliye naverok û hilbijartina babetê çîrokê ve pesnê M. Botan bide çûna xwe ya Diyarbekirê bi zimanê çîrokê ve girêdide û tiştê pir xerîp çûna xwe dike bingehê naylontiya çend peyvîn zimanê Kurdî. Nizanim R. Alan şeéra Mîeyid Teyîb ya bi navê 'DIHOK' xwendîye an ne? M. Teyîb bi zimanê xelkî, bi xelkê re weke dipeyive û çêlî bihar û zivistan û payîz û havînê Dihokê dike. Belê ez bawer nakim bi te-nê zimanê vê seérê R. Alan bigihîne Dihokê û ew bika-re gelyê Dihokê bi me bi-de nasîn.

R. Alanî ne gotiye kîjan nivîsîn dirêj riya Diyarbekirê lê birîne. Belê sedema vî tiştî ne ew e ku nivîskarê nivîsa dirêj ne bi tenha bi zimanê xelkî napiyive an zimanê wî naylon e. Mirov dikare bibêje ew ji "ne têkirina" xwedîyê nivîsa dirêj ne bi tenê bi zimanê wî ve girêdide, eger di de-wama gotara xwe de me-bestâ xwe eşkere nekiriba.

Helbet gelek peyvîn zimanê din ketine nav zimanê me û di nav sedsalan de ji aliye fonetik an me'nê ve hatine gûhûrîn an wek xwe mane û bûne malê xelkî. Belê em baş pê dizanîn ku jérdestiya welatê me -ku R. Alanî bi kurtî çîlkiriye- we kiriye ku ci-dahîyen zaravan mestir lê bênen, devok bere bere ji hev dûr bikevin û bi sedan peyvîn me li ber piyan biçin. Bo nimûne; ma Kurdîn Diyarbekirê ji avabûna "Ulu Camî" yê û hir ve bi vî navî wê mizgeftê nas di-kin? An Kurdeki Diyarbekirê ji hevalê xwe re digot: "Were. Em herin Balıqçılaraşî û quşbaşiyekê bixwin" berî ku Tirk bênen û welatê me dagir bikin?.

Bê şik evan her sê tiştan ji navê xwe yên resen he-bûn û belkî hê jî hene.

Nemaze van salêna dawî li her çar parçen Kurdistanê jî delîve û mecalek xwestir li pêş zimanê Kurdî vebû. Rojnemegeriya Kurdî li gor salêna bûrî gihişt gahi-nekek bilind. Bi sedan ki-têbên bi Kurdî çap bûn. Kurda pitir pûte bi zimanê xwe dan. Gelek xwendevanê Kurda êdî zimanen biyanî hêlan bi Kurdî dest bi nivîsîna berhemên xwe ki-rin. Belê vê rewşê tesîreke negativ jî li ser me kir. Bi navê xwerûkirina zimanê Kurdî hinek kesen neşare-

ze rabûn û li gor zanîna xwe, ne bi riyê ilmî, ji nik xwe "navên Kurdî" ji bo hinek tiştan çêkirin. Hinek kes jî bêyî ku lê biggerin an bipirsin, ka Kurdiya pey-vekê heye an ne, hin eşrîn Kurdistanê an li hinek de-veren Kurdistanê xelk ji "wê" re ci dibêjin, peyvi-ne Erebî an bi Tirkî paras-tin. Ez dibêjim eger R. Alan berî danana peyva "mişterî" yê li gelî û newa-lân Botan an Hekariyan bi-geriya wê sedê sed pêrgî "bikir" ên pezî, bikirê mazîyan hatiba û wê di şû-na 'mişteriyê' de peyvek din danîba. Ma çîma em peyvîn xwe yên mirî nave-jînin, an yên birîndar der-man nakin?

Alanî ne gotiye ka diya wî li ku dijî. Li gundekî, li ba-jerekî? Mamosta ye an rîncbera malê ye? Ageh ji rewşa zimanê Kurdî heye an ne? Û li gor gotara wî tiştê herî giring li Mereşê, li Diyarbekirê, li Cizira Bota, an li Mahabadê rû-dune. Çinku peyvîn bi ya R. Alanî naylon an tewşo mewşo li gelek cihê din ên Kurdistanê "awirmîş" in û peyvîn xelkî ne. Çedî-be gundiyeke Diyarbekirî bibêje: "titina min sert e" yê Botî bibêje "titina min dijwar e" an yek bibêje "ev karekî çetin e" yê din bibêje "dijwar e". Xelkê Botan, Hekariyan, devera Behdînan hemû û Soran seranser bêyî ku bi biyanîbûnekê bihesin, bi serbestî vê pey-vê bi kar tînin. Ev peyvîn xerîp û petî zimanê xelkî ye ku şerme mirov li ser "naylontiya" wê bipeyive.

Ka çawa "mîhûm" li Diyarbekirê zimanê xelkî ye û xelk biste bi kartînin, wi-lo "giring" li nav soran û mirov dikare bibêje li Behdînan zimanê xelkî ye û xelk biste bi kartînin. Nizanim li ser ci esasî R. Alan "giring" kiriye naylon? Peyvek bi soraniye û bê şik zimanê xelkî ye.

Eger R. Alanî ji Kurdîn Dihokî -Zaxoyê- Amêdiyê bipirsa hema ji binî xwe nêzîkî "anko" "ango" yê nedikir. Wê bizaniba "anko -anku- angó" bi Kurdiye û li ser ci masa nehatiye çêkirin. Wisa bi Kurdiye ku gundiyevan ciha di şûna "ye'nî" yê de, bê tirs bi kar tînin, bêyî ku yek bi-wêre û ferma 'naylontiya' wê bide.

"Sipas". Rûs jî, Faris jî bi kartînin. Lî li Kurdistanâ Başûr û Rojhîlat jî ev gotin ketiye nav zimanê xelkî. Ji mêj were di rojname, kitêb, telewîzyon û radyonê Kurdî de bi kar hatiye. Gava tu ji kurdeki van cihan re bibêjî: "sipas" ew dîza-me besta te çiye û li benâ 'mala te ava' - 'xudê em-e te dirêj bike' - 'memnûn' namîne. Her weha li Kurdistanâ Bakur û Rojava jî

ev peyv ketiye ser devê ge-lek Kurdan û eger ev gotin di jiyana rojane û di weşanîn Kurdan de bi kar bê û xelk jê razî bibe ne ez û ne R. Alan, em nikarin pêşî lê bigrin

Em dizanîn ji bilî zaravên cihê, di navbera 'zimane' du gund an du eşrîn, xu-danênek zaravî de ji cida-hî pir in. Meselen: eşrîn li ser sînorê K. Iraqê û K. Tir-kiya navên cihê li "tawa" yê dike. Yek dibêje -tawa-ya din dibêje -miqîl-, ya din dibêje -rûnbîrêşk- ya din dibêje -dûvdîrêşk-. Te-vî ku her çar eşîr jî cîranen hev in.

Gava Kurdeki Amêdî, ye-kî Diyarbekirê, yekî Efrînî, yekî Entabî, yekî Qila-bî bi hevdu re -biştexilin, bîpeyivin, baxivin, sorbi-kin, xeber bidin- helbet wek dilê xwe ji zimanê hev tînagîhin, tevî ku hemû jî bi Kurdî û bi zimanê xelkî dipeyivin. Ji ber vê yekê dema em di rojnaman de an dijîyana rojane de rastî peyvine "biyan" an "naylon" tê, em nikarin hevdu qayîl bikin. Çinku ji biçûkatî were belkî hezaran cara me peyvîn devera xwe bikaranîne, bîhîstine. Gava peyvek ne ya cihê me bê gotin -tevî ku peyva xelkî ye- bi me giran tê, ji ali-yê tîgîhiştinê ve zehmeti-yan derdice.

Hebûna zaravên cihê, ci-dahiya devokan, nebûna rîzimanekê yekgirtî û bê guman jérdestiya welatê me astengen li pêş "zimanê edebî- yekgirtî" yê zimanê Kurdî ne. Eger em ji dil ji bo maliştina van ast-tenan nexebitin, li zimanê xwe û li peyvîn petî ên wî xwedî dernekevin, di vî warî de xemsariyê û sistiyê neku-jin, em nagîhin ar-manca xwe. Lewra divê nivîskar û şâ'irîn Kurda, mamostayen zimanê Kurdî û her Kurdeki yê bi Kurdî dixwine û dinivise an li ser zimanê Kurdî dipeyive -çi kêm ci zêde- ha ji zaravên din, devokên din hebe. De-ma li ser peyvîna daxive baş lêbikole, bipirse û paşê bigîhe encamekê. Ne he-ma her yek ji me ji ber ku devoka wî de nine, ji nik xwe rabe û kîrsê naylon li peyvîn Kurdî bike.

Bê guman bi Kurmanciya heyî. Lî ne bi Kurmanciya bi -Balıqçılaraşî û "Quşbaşî" û "Ulu Camî" dixwine (pozbîlîndî, dikûxe) û patka xwe dide "Dijwar" û "Anko" û "Spas" û "giring" e.

BERSIVA T.OZAL

□ Serokwezîrê Tirkîyê Turgut Ozal di civînek xwe de ji rojnamevan re digot:

—Di mesela îrtîcayê de ez jî wek Serokkomar Kenan Evren difikirin. Îrtîca hêzék wisa ye ku hertim tahlûke ye... Li ser viya rojnamevanekî jê pirsî:

—We di axaftina xwe ya Edenê de gotibû, "3-4 keçika serê xwe girêdaye, navê vî kirin îrtîca. E viya ne îrtîca ye, dibê meriv meselê pîr mezîn neke... Lê Kenan Evren wek we nafigire. Di dû axaftina we re got ku "îrtîca tahlûke ye." Gelo çawa bû ku iro hûn jî wek wî difikirin?

T. Ozal, bel bel li nav çavê rojnamevan nêrî û bê dil mizicî Rojnamevan pirsa xwe ducar kir, wi jî diranê xwe qîç kir, got:

—Hîhî, hee..

Rojnamevan hîn xwe hazir dikir ku carek din bipirse, hevalê kîleka wî nuucandê :

—Ma malava tu ci ji rebeno dixwazî, tu nizanî ku ji tirsa Ev-ren newêre teştekî bîbêje.

TERMOS Û KENAN EVREN

□ Serokkomarê Tirkîyê General Kenan Evren hin fabrikator û tacirê Amerîki ezibandibû şîvê. pişî demek dirêj, êdî şev zîz bûbû û milet ji xwe re dest bi ken û heneka kiri-bû. Tacirekî Amerîki ji Kenan Evren pirsî:

—Li gor te li dînyayê icada herî mezîn çiye gelô?

Kenan Evren bîstekê ponîjî, çavê xwe di ser hev re qeli-band û got:

—Bi a min li dînyayê icada herî mezîn çêkirina termosê ye.

Xwedî

ê pîrsê bi dengekî hêlî got, "ci, te got termos?" Li cem balafîrê, telewîzyonê û kompûterê ma ci xusûsiyeta termosê heye?

Kenan Evren got, "Erê heye û bi baweriya min pîr jî heye. Carê berî her tiştî avê sar û germ digre. Ez bi xwe tu iça-dek din ji vê muhîmtir nabînim..."

Mîvanî Amerîki got, "serokkomarê hêja, ev yek ne tişkî pîr muhîm e."

Kenan Evren, "Muhamî û him jî pîr û pîr. Carê berî her tiştî, çawa dizane kîjan av sar û kîjan av germ e?"



1 Nisan 1942: Di bin berpîr yariya Celadet Alî Bedirxan de kovara Ronahî dest bi weşanî kir.

3 Nisan 1925: Solxan û Müş ket destê hêzên Şêx Seid.

6 Nisan 1925: Leskerên Tirk Darahêne bi çarmedorî işkal kirin.

6 Nisan 1970: DDKO (Komela Çandî ya Şoreşgerên Rojhîlat- mebest Kurdistan e) bi navê "Bulta-na DDKO" kovarek derxist

12 Nisan 1925: Darahêne ket destê leşkerên Tirk.

13 Nisan 1909: Rojnama Kurdistan a ku 1909'a de dest bi weşanî kiribû hate girtin.

14 Nisan 1979: DDKD li dijî buhabûnê li Diyarbekrê me-sêk çekir.

15 Nisan 1925: Şêx Seid û 30 hevalen wî hatin girtin.

15 Nisan 1963: Kovara Deng dest bi weşanî kir.

16 Nisan 1925: Doktor Fuad û Şêx Eyûb hatin idamkirin.

17 Nisan 1980: Militanekî Rizgarî, Yaşar Gundoğlu li An-qerê ji alî polîşen faşist bi işkencê hat şe-hîdîkirin.

20 Nisan 1979: Şerî Nekedê. Bi fitna hukumetê Kurd û Tirk bi hev dikevin. Şer sê rojan dom dike, bi sedam kes dimrin.

22 Nisan 1898: Rojnama yekemîn a Kurda bi navê "Kurdistan" ji alî Mîkdat Bedirxan ve hat derxistin.

22 Nisan 1924: Tîrkan riya hesin a (Anadol-Baxdad) ku ji Kurdistanê derbas dibû standin.

22 Nisan 1975: PPKK (Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan) hate damezrandin.

23 Nisan 1920: Meclîsa Tirk civiya. Di vê civîna pêşinde wesîqa "Mîsakî-Millî" hat qebûl kirin. Li gor vê wesîqa Kurdistan jî ji axa Tirkîyê qebûl dibû.

24 Nisan 1915: Qetîlîma li dijî Ermeniya û roja pîstgirtina Ermeniya.

24.4.1921: Serhiladana Kocgiriyê têkçû.

24.4.1924: Destûra Cumhûriyeta Tirkîyê ku li ser mafê Kurda tiştek tê de tune, hate qebûlkirin.

26.4.1897: Hîmdarî elfaba Latinî ya Kurdî û rîzimanâ

Jinê Kurd 8'ê Adarê pîrozkirin



Li Swêd jinê Kurd bi du şe-va û mitînga 8'ê Adarê roja Jinan pîrozkirin. Şev li Stock-hlom û Uppsalayê hatin çekirin.

Komela Demokratik a Jinê Kurdistan di 7'ê Adarê de li Stockholmê bi munesebata 8'ê Adarê roja piştigirî û têkoşîna jinîn dinê, şevel amadekir. Di şevê de li dora 700-800 kesî besar bûn. Programa şevê gelek dewle-mend bû. Koroya komelê; du grûbêñ folklorê û piyesa ku komelê amadekiribû piştî xe-batek dûr û dirêj derketin hemberî mîvanan. Dengbêjê komelê, Zozan, Zelal û deng-bejê mîvan Brîndar û Fax-redîn jî bi stranê xwe ve di

şevê de besar bûn.

Şeva duduyan ji bal Seksiyo-na Jinê Kurdistan a girêdayî Komela Kurdistan li Uppsalayê roja 14'ê Adarê li Uppsa-la hate hazirkirin. Di şevê de li dora 200 mîvanî besar bûn. Folklorâ komelê deng-bêjêñ endamêñ komelê û Ku-lîk derketin hemberî mîvana. Bêyî van, Jinê Kurd roja 8'ê Adarê besarî mitînga, ku Komîta 8'ê Adarê ya Swêd amadekiribû, bûn. Komela Demokratik a Jinê Kurdistan endamêñ Komîta 8'ê Adarê ye. Komele ci di xebatîn beriya mitîngê de be û ci jî di xebatîn roja mitîngê de be bi şikleki aktivî di gişan da basar bûn.

DANIMARKA

8'ê Adarê roja jinan ya navnetewî hat pîrozkirin

8'ê Adarê roja jinan ya navnetewî li paytexta Danîmarkayê hat pîrozkirin.

Di civîna pîrozkirina 8'ê Adarê roja jinan de gelek kes axif-tin. Hemûyên wan jî di ahaftinê xwe de li ser têkoşîna jinê cihanî sekinîn û rewşa iro ji gelek alî de anîn ber çav.

Di civînê de Dayka Kumet jî li ser navê DDKAD'ê ahaftinek kir.

Dayka Kumet bi kurtayî li ser rewşa jinê Kurdistanê sekinî û zordariya ku di warê aborî sosyal û cinsî de li jinê Kurd dice anî zimîn.

Dayka Kumet di ahaftina xwe de cezakirina 6 jinê Kurd ên endamêñ DDKAD'ê jî protesto kir. Û her wisa zulm û zordariya cûnta faşist a Tirk rûres û mahkûm kir.

Muxabirê Armanç
Danîmarka

Êrişa Cûntayê Li Ewrûpa hat protestokirin

û Demokrasi a Pisgiriya Îran û Iraq jî di meşê de ci girtin û bi hev re belavok belavkirin.

Almanya-Hamburg: Li Komele û hêzên Kurd û Tirk bi hev re belavokek belav kirin û di 14'ê Adarê de jî li ber Konsolosxana Tirkîye meşek protestoyê çekirin. Belavoka di derheqî meşek de li hemû rojnamevanan hat belavkirin. Pirraniya rojnama ev xeber weşandin.

Di meşê de li dora 400 kesî besar bû.

Almanya-Hannover: Li Hannoverê di 7'ê Adarê de grûbek pişvanêñ KKDK radyoya Bakur îşkal kirin. Bi vê teverê wan daxwaz dikir ku ew bi weşanê xwe êrişa Tirkîye protesto bi-kin. Û roja 7 û 8'ê meşê li ser êrişa Tirkîye bi berpirsiyarek KKDK re hevpevînek hat weşandin.

Cardin, gelek komele û rêxistinêñ Kurd û Tirk bi hev re li Bochum, Ludenseid belavok belav kirin, li Essenê li ber Kon-solosxana Tirkîye meşek bir girseyî çebû, belavok hatin belav kirin, li Bremenê buroya SPD'ê hat îşkal kirin, li Gissen belavok belav bû, ji bo ûnformasyonê mase hat vekirin,

Partiya Gel a Kurdistan, Şoresserê Kurdistan, Partiya De-mokrat a Kurdistan-Rêxistina Netewî, Yekîtiya Sosyalist a Kurdistan û Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan bi hev re pres-konferansek çekirin û belavokek belav kirin. Li aliye din, KKDK û parlamente SP'D'ê yê serokî grûba parlamento Ewrûpa jî civînek çekirin û bi belavokekê êrişa cûntayê protestokirin.


Swêd-Stockholm: Li Stockholmê roja 7'ê Adarê Federasyona Komelê Kurdistan û ji her çar perçen Kurdistanê rêxistinêñ Kurd li dijî Konsolosxana Tirkîye meşek protestoyê çekirin. Berî ku meş bi re keve, parlamente Partiya Sosyal Demokrat Hans Göran Frank û parlamente Partiya Komunist a Çep li dijî êrişa Tirkîye ahaftinek kirin. Her du parlamente jî êriş mahkûm kir û piştigirî xwe bi gelê Kurd re nîsan dan. Di meşê de dora 200 kesî amade bûn. Cardin, ji her çar perçen Kurdistanê li ser navê 13 rêxistinêñ Kurd Komitek çebû, belavok hat belavkirin û merkezin her çar partiyen Swêd yê di parlametooyê temsil dibin bi gelek kesî ve hat ziaretkirin; ji wan daxwaza protestoya Tirkîye hat kirin. Bêl van teveran, li Afîna, Amsterdam, Duisburg û hin welat û bajarê din jî protestoyen bi vî rengî çebûn, bi hezaran pêşverû şoresserêñ Kurd û Tirk ev êrişa hov û xwînrej protesto kirin.

Hemît Akil û 6 xortêñ Tirk hatin bi bîranîn

Roja 16'ê Adarê li dora 200-250 xwendevan bi qeranfilen sor 7 xortêñ şoresser bi bîranîn 16'ê Adara 1979'an li ber derê Universita İstenbolê faşîsta bombe avêtin nav komek xortêñ şoresser ku ji mektebê derdike-tin. Di vê qetliamê da 7 şoresser şehîd ketin. Ji van yek jî endamê PPKK û endamê suba DDKD a İstenbolê Hemît Akil bû. Roja 8 saliya bîranîna wan dora 200-250 keç û xortêñ xwendevan li şûna ku lê şehîd ketibûn civiyan û bi qevda qeranfil danin wir û de-qâkê ji bo wan di giramiye de rawestiyen.

Düre belav bûn. Polisên cûnta faşist vê carê dereng man. Heta hatin wir kes nema bû. Bi jop, sîleh û kameraya video-yê şûnda vegeriyan, muwefaq nebûn ku kesî bigrin.

Me heval Adem wenda kir



Di 25'ê meha sibatê de me heval Adem di qezak tirafîkê de wenda kir.

Di sala 1982'a de li Almanya Federal li bajarê Giessenê Adem bû endamê KKDK û di nav vê komelê de xebata xwe ya demokratik da commandin. Bi fedekarî, durustî û xebat-kariya xwe di demek kin de xwe bi hemû hevalen xwe de hezkirin.

Li aliye din wî, di komelê de berpirsiyariya beşê tiyotrayê jî dikir.

Heval Adem ji ber hin sebeban vegeriyan Kurdistanê. Li welêt jî xebata xwe ya welatparezî da commandin. Bi bihistina vê xebra reş hemû heval û hogirên Adem xemgîn bûn.

Adem Sürütü li navça Swêregê hatibû dinê.

Hevalen Adem Giessen

Parlementerê Alman Gert Walter; “Heya pirsa Kurdan.....”

Destpêk r.1

Almanya dijîn.

Gerd Walter jî dîtinêñ xwe li ser van pirsên mijulgûbîyi ji berpirsiyarek KKDK re got û piştigirîya xwe bi têkoşîna gelê Kurd re, ya ku ji bo mafêñ neteweti û demoqrafi dide, anî ser ziman.

Ev civîn di atmosferekî xweş û hevalbendî de derbas bû. Herdû alî jî jê memnûn man. Di dawîya civînê de Gerd Walter û KKDK e.V. bi hev re komînîkîyek derxistin. Û ew di roja 10.03.1987'de belakirin. Em Kurdiya wê pêşkêşî xwendevanen xwe dikin:

“Berpirsiyarek ‘Federasiyona Komelê Demokratîn Kurdistana e.V.’ (KKDK e.V.) û miletwekiliyê parlementoya Ewrûpa yê SPD Gert Walter di 27.2.1987 de li Lübecke hatin cem hev.

“Li Lübecke endamê sosyaldemoqrat û parlementoya Ewrûpa Gerd Walter bi berpirsiyarek ‘Federasiyona Komelê Demokratîn Kurdistana e.V.’ (KKDK e.V.) runiştinek pêkanî.

Miletwekiliyê Ewrûpa li ser rewşa Kurdistana Tirkîye ya iroyîn û li ser bindestiya netewê Kurd bi dûr û dirêjî informasyon girtin.

“Berpirsiyarek KKDK e.V. beriya her tiştî bal ki-

Faşîst dîna jî dikujin

Ehmed Fennan, erebekî ji serêkaniyê, aqil sivik, yanî wek di nav xelkê de tê gotin, dîn bû. Herroj li qehwe û çayxanan û mal û koldan yen bekî yeti digeriya û şahî û henek dixist nav xelkê cî.

Lê, Ehmed Fennanê rebenê êsîr bi vê kêmeqiliyê dê çi bizanibîya ku faşîst dînan jî dikujin. Belkî vî belengazî di temamê jiyanâ xwe ya 35-40 salan de, navê faşizmê jî qet sehnekirbû. Lîbelê, li ser hemî vê rewşa wî hin tişt hinek caran ji ber çavên wî nedireviyan, didit ku mal bi hev ve ne lê têl kişandine navbera wan. Ji vî milî xelk ji mala xwe derdikevin, ne tenê ku ji yên milê din re nikarin bêjin “rojbaş” û yan “gelo apo, xaltî, ü.h.w.d tu çawa yi” nikarin berê xwe jî bi ber wî milî de bikin. Wextê bikevin mala xwe hewce ye serê wan li ber wan be û qet li pêşîya xwe nenêrin û bi vî nedîti, her ciqas dîn be jî, bala Ehmed Fennanê belengaz dikenjand û ji xwe re dibêje: “gelo ma ev ci ye, welle ezî iro biçim milê din jî bigerim, ka gelo ev ciye.”

Cî tê serê wî ji vir pê de tê. Di 3'ye Adara 1987'an de ber bi “sinor ve dimeşe. Dema nêzikayî li eskeren Tirk ên faşist dike, bi teqîna tivingan gullê wan di beden û mîjîyê xwe de dibîne. Nava roj, laşê vî rebenî dikin serrad. Ü di ser de jî ji bo sitandina teskerê û rojek zûti xwe xelaskirina ji vê ocaxa faşist, zû bi zû laşê wî belengazî radikin û teslimî zabitê (subayê) xwe dikin.

Tehdît li ser tehdîdan li Suriyê dikin û dibêjin ku we “sinorê” me ihlal kirî. Lê piştî sê rojan, piştî ku Suriye wan agahdar dike ku dînekî wan ê bi nav û deng kuştine, bê qîr û qelebalix di 6.3.1987'an de laşê wî didin dewleta Suriyê.

Ev hedisa han, bi rastî dilê xelkê Serêkaniyê, ji ereban bigre heta Kurdish, yê herkesi gelek êsand. Lê mixabin roja iro ji kerb û kîna li hemberî Tirkîye ya faşist pê ve tiştek ji destê wan nayê.

Mahkema Rizgarî qediya

Semîner li ser dîroka rojnamegeriya Kurdi

Kurdî

Di 14 meha Adarê de li bajarê Uppsala, Dr. Cimîd Heyderî li ser dîroka rojnamegeriya Kurdi semînerek da.

Dr. C. Heyderî di semînere de li ser dema navbera salên 1898 û 1985 sekinî û ev dem jî bi çar qonaxan ji hev cuda kir. Her wisa ew li ser rola rojnamegeriya Kurdi di tevgera Kurdistan de sekinî û di vî warî de hin mînak pêşkêş kir. Semînerê gelekî bala guhda-ra kişand.

MA EDÎ NE BES E?

Zekî SEYDA

Vê sibê (3.4.1987) cardin firokên (teyarên) ordiya Tirk, erîş birin ser Kurdistana Iraqê. Jin û zaro kuştin. Nizam ev cara çendaye, edî buye edetî. Berpirsiyarek hukumeta Tirk got ku, firokên wan wezîfa xwe bi cî anîn, hereket bi serketî kirin, çeperen cudaxwaz û eşqiyan hilweşandin. Wî da zanîn ku ordiya û dewleta Tirk zexme, wî ji heqê “cudaxwaz û eşqiya” bê. Di pey ra temamê partiyen Tirkîye (DSP, DYP, SHP, ANAP) bi hev re gotin ku “ordiya me wezîfa xwe kirî. Di heqê cudaxwaz û eşqiya de wê bê” yanî ji “sosyal demokratian” bigre heta “burjuwaziyê demokrat” giş bi hev re ji mehûkirina “cudaxwaz û eşqiya” û ji serketîna ordiya xwe kîfîxweşbûn. Eva han baş dide nîşandan, ku di mesela Kurd û Kurdistanê de hemû hêzên Tirk bi hev re ne.

Ji hêla din; gelê Kurd bi surgûnê ji ciyê wî dikin, dişinîn alî Anadolê. Mehûkirin û qetlikirina gelê Kurd ji avabûna Cumhûriyeta Tirkîye vir de her berdewam e, lê ji 12 İlönê vir de, edî bi awakî hovîfî dom dike. Tu awayên huquqî nas-nake, qanûna xwe ya faşist jî nade ber çavan. Ev wehşeta han di paşıya sedsala bîstan -ku çend sal ma ye bigîhê ya bîst û yeka- de li ber çavê cihanê dibe.

Dewleta Tirk bi ya huquq û peymanen navnetewî nake. Ev cara çara yan jî a péncâ ya huquq û navnetewî jî dide bin piyan, lê tu kes, tu tiştekî nabêje. Dibe ku hin dewleten dinê û sazûmanen navnetewî, bi çend gotinan bêjîn, ku “ev li gor huquq û nisan û navnetewî ne rast e” Ew qas!

Lê gava mesela gelê Kurd tê holê: Ji hezar çemî av tê anîn. Tê gotin ku “ji bona aşîtiya dinê xeter e. Sinorê dewletan ên ku bi peymanen navnetewî hatin danîn hene. Em divê li gor vê hareket bikin” Lê dewleta Tirk vana gişa dide bin lingan, kes jê re tiştekî nabêje. Íro li dinê hukmê qanûna çiya (qanûna hovîfî) derbas dibe, kî xurt be wê yê din bipelçiqîne, tu kes nikare tiştekî jî bike û ên bibêjin jî gotina wan pere nake.

Lê rewşa hêzên rizgarîwazên Kurd ci ye? Bi piranî jî yên Kurdistana Tirkîye dilê meriv dişewitîne. Ne li Kurdistanê, hema li dervayî welat jî, tu yekitiyek çênekirine. Gava meriv şertîn Kurdistanê yên iro dide ber çav; gelo pir tiştekî bişbin wexta Şerê Cihanê yê Ewil (1914) û yên dema serihîdan (1920-1940) tune ne? Li gor guherandina dinê hin tişt guherine lê di bingeha xwe de pir tişt bişbin yên wê çaxê. Gelo tarîx tekerur dike? Lê divê neke.


Íro tenê riyek li ber gelê Kurd heye. Yekkirina hêzên xwe li her ciyî û axaftina bi dijmin re weka ku ew jê fam dike. Wekî din rî nemaye.

İsmail Beşikçi namzetê Nobelê

Dr. İsmail Beşikçi ji aliyê du parlementerê Australayê ji bo namzetê xelata Nobelê ya Aştiyê hate nîşandan.

Parlementerên Australya Michael Maher û Dr. A. Theophanous namek ji parlementoya Norveçê re şandin, Dr. İsmail Beşikçi layiqê xelata Nobelê ya Aştiyê ya 1987'a ditin.

Michael Maher di nama xwe de; "Gelê Kurd ji demen kevnar de li Kurdistanê jiye, ku du şerê cihanê yê yekem welatê wan hatiye parvekirin, ku karbideşten serdest dixwazine ev gelê Indo-Ewropî bi hekmê zorê asimile bikin... Dr. Beşikçi merovekî camêr û mîrxas e, ku bi pê-nûsa xwe hat alîkariya vî gelî û ji bo bîrûbaweria xwe nerxek pîrî gîran pêşkêş kir û hêîroj ji di gîrtîgêde ye... Loma, ev merovê hêja layiqî xelata Nobelê ye" got.



Civîna Yekîti...

Destpêk r.1
dibe. Xizanî berfîreñ dibe, nexweşiyê derêmî, intîxar, fuhuş (xwe firotina jîna) û sucen adî bi awayekî nedîti zêde dibe. Li Kurdistanâ Tirkîyê terora dewletê bi hemû hêza xwe ve dom dike; tade, teror û urfi idare hebûna xwe di-parêze. Gundan Kurdistan bi zorê û bi wesişen derewîn valadikin. Rejima diktatorî vê dawiyê pîlanek nuh daye ber xwe ku surgûnek gelek fireh û giran pêk bine. Bi viya dixwazin gelê Kurd bîhelinin û têkoşîna wî ya netewî û demokratik vemirîn. Bi kurtayî; wek idîyân pasverûyên Ewrûpî dibejîn li Tirkîyê demokrasî tune, mafen esastırın ên mirovi didin bin lingan. Em wek partiyen Yekîtiya Çep bangî hêzên pêşverû yê dinê dikan, ku ji bo piştigriya aşti, demokrasî û mafê merovatiyê, dengen xwe xurttir bilind bikin.

Dr. Theophanous ji; "Dr. Beşikçi merovek bi qiret û cesaret e; wî tu karêñ xirab nekirine, ne ji kesek kuştiye. Ew, bi mîrxasî bi pênuşa xwe hatiye alîkariya netewî Kurd. ji bo vî karê wî, ne tenê ew hatiye gîrtin, lê karbideşten Tirk desten xwe dane ser kar nîvis, diplom û jîyana wî ji. Wisa ez bawerim, ku Dr. Beşikçi layiqî xelata Nobelê ye" got.

Rastiya bûyera Nêrwîh ê

Şeva 23'ye Sibatê li Nêrwîh (dewletê navê wê kirine Taşdelen) gundê Uludere 14 kes hatin kuştan û 9 kes ji birîndar bûn. Di dawîya meha Sibatê de li ser vê qetşamê pîrî hat peyivandin, gelek supeklasyon li ser hatin çekirin û bû xebera heri sansayonel.

Li ser armanc, sebeb û fai-len vê bûyera bi xwîn radyo, televîzyon û rîexistinê demokrat û şoresgerên Tirkîyê û Kurdistanê ji wê ji geleç aliyan ve li ser vê bûyera bi-sekinin, bîr û bawerîyen xwe bibêjin û bi riya wesanen xwe wê gel jê agahdar bikin.

Qetşamâ gundê Nêrwîh û bûyeren di pê re çebûn, meriv bi tu hawî nikare ji gelşen Rojhîlata Navîn û Kurdistanê û dolabên têngerrandin cihê bike...

Wek tê zanîn ji sala 1980'ı û vir de ye ku cûnta faşist ji bo ku êrisi Kurdistanâ Iraqê bi ke çend caran provakasyonê babet bi babet çekir. Di sala 1983'a de li mezra Yekîtiya Uludere kuştina bîn-basiyekî û deh leskeran kirin sebeb û Kurdistanâ Iraqê herêmén siwil û pêşmergan bombardûman kirin. Van êrisan ji ji bona gihiştina armancê, ji cûnatayê re qîm nekir. Her care ji cûntayê sebeb û hedefa êriskariya xwe "hatîna" teroristan ji Kurdistanâ Iraqê" nîsan da. Failen bûyeren êriskariya xwe her li Kurdistanâ Iraqê nîsan da. Failen bûyeren êriskariya xwe her li Kurdistanâ Iraqê nîsan da û li wir li wan geriya. Qetşamâ Nêrwîh ji provakasyonê ye û cardin li gor cûntayê en qetşam çekirine reviyane Kurdistanâ Iraqê; dibe têkevin wir û bigrin...!

Çima Sahne Nêrwîh e? Gundê Nêrwîh, gundekî bi du hezar nîfus li ser sinore Kurdistanâ Iraqê ye. Ji ali warê coxrafik ve, nuxta riyan derbasbûna Kurdistanâ Iraqê, ciheki heri muhîm e. Gel welatparêz û û bi taybeti ji gundekî ku gelek keda wan derbasî tékoşina Kurdistanâ Iraqê bûye. Cûnta faşist, bi her awe entrîkayen pasverû zor da gundiya ku wan ji xwe ra bike kole, bitîrsine yan mecbûri barkirinê bike. Pişti heft salê terora faşist û dek û dolabên nemayı, bi MİT'êne xwe û kükîkên xwe, bi pera, bi pîkirina dijayedî û dijimi-natiya nava eşiran bi zorê grûbek milis ji şes kesan li gund çekirin.

Qet yet kesê Nêrwîh ji tu-neye, ku zulm û zora hêzên kolonyalîst, ji kote û leda-

Kurdistanâ Iraqê ya 1975'a 12 malen Pêşmergan li Nerwîh bi cî bûn û ew heta derba 12'ê ilonê bi alîkariya hemû gun-diyan hatin parasin. Gundian xaniyên xwe dan wan û hemû hewcedariyên wan li gora şertîn gund hatin bi cî anîn. Heta bigîhîe êzingên şewatê ji gundiya temîn dikir. Kesen cî, bi cebilxane û sile-hen xwe ve, bi dilen xwe mufrezak pêşmergan avakîrin li Kurdishâ Iraqê teví ser bûn. Vana hemû welatparêziya gundiya, kîna wan ji kolonyalistan û hêvî û bawerîya wan ya bi şoreşî nîşan di-de. Bê guman çavtarsandin û tahrîkirina gelé gundekî wi-sa wê ji bo hêzên kolonyalist tişteki pîrî muhîm be; ku tu carî nîxwazin dev jê berdin.

Gel gundê Nerwîh niha şî-nî ne. Du zarokên keçik, ku bi zanetî navê wan danî bûn Leyla Qasim di nav de 14 kes bi yek carî kinor gorrê. Wezi-re Kar û Barê Hundur Yildirim Akbulut, Mudurê Emniyetê yî Gişî, Walî û Qoman-doyen destbîxwîn li Nerwîh hêwîrin. Axaftinê ji bo ku hisen gel istîşmar bikin kinin û gelek soz dan. Gelek xwîdan rijandin ku derî xwe dijmina rî gelê Nêrwîh bidin. (....)

Kolonyalisten faşist heta ji wan tê bira têkevin rolê Xocê Xizir, em gelê Kurdistan û gundiyen Nerwîh wan baş nasidîn. Em sebebeñ vê qetşamî yê esasî û xwedîyê wê baş nas dikin. Gurê ku ketîye poste berxê dijminekî ci hût e ji serpîhatiyen salen zanîn.

Qetşamâ Nerwîh ji bona tecrûben îşxalkirina Kurdistanâ Iraqê senaryoeye ku hatiye hazirkirin. Amadeka-ren senaryoeye MIT, Kontrgerilla, rîexistinê "anti-teror" in. Cûnta faşist wê qetşamî dike stûyê PKK (Apociyan) e. Di şexsê PKK de hemû hêzên Kurdistanê yê welatparêz wek dijminê can, mal û namûsa mîlet ûlan dike û ew ji sidar û piştevan!...

Li ser vê qetşamî beyana Apociyan ya resmî vê ci be, eme di pêş de bîmîn. Dibe ku bi puntöyen mazin binivîsin ku "Me milisîn gundan ceza kir". Bi iştîmalek xerab heger Apocî vê qetşamî bigrin ser xwe ji, senaryoya MIT'ê ye. Kê, ji bo ci û ji kîjan armancê ev qetşamî kiri-be ji, lê di esasî xwe de mesûl cûnta faşist û çetîn Evren û Ozal e. Ü heta ku gelê me vê diktatoriy hulnesine provakasyonen wisa wê wek perçak ji jîyana rojane her bîn çekirin.

(Kurtayîya nama B. Zerdeş, ji hejmara 52'ya Pê-sengê hatiye gîrtin)

Destpêka jiyana...

Destpêk r.2

1872'ya dest bi weşanê kir. Navî rojnamê "Ayintab" bû û ji bal Koleja Amerikî (ya li Entabê) dihat derxistin. Rojname bi tipen latîn û zimanê Tirkî ji heftê carekê cap dibû. Bi piranî xitabî civaka Ermeniyan dikir. Nayê zanîn ku rojnama "Ayintab" ci wextê hatiye gîrtin.

Pişti vê, sala 1886'a, di bin serokatiya (rêberiya) Dr. Trowbridge, ji bal şagirtên beşî tibê yê kolejê, ji mehê carekê rojnama "Avedaper" hat derxistin. Gava sala 1896'a beşî tibê hat rakirin Beyrûdê, dawî li jiyanâ vê rojnamê hat. Lî di navbera salen 1907-1920'an de bî-rayen Harzetyan, her bi vî navî rojnamek derxistin. Rûpelekî vê rojnamê bi tipen Erebeî û yê din bi tipen Ermenî dihat çapkirin (9).

Li Mûsilî ji, sala 1882'ya rojnama "Mûsil" dest bi weşanê kir. Ev rojname ji bi zimanê Tirkî û iştîmal bi zimanekî din di hat çapkirin ku ne hatiye kifşkirin.

Di çapxanen wilayetan de, ji bili rojnamen resmî yê wilayetan, gelek kar û barên kirtasiya burokrosiya wilayetê ji dihat çapkirin. Bi van re, salname, kitêbên dînî û edebî û ilmî ji dihatin çapkirin (10). Ji bili karêñ dewletê yê şexsan ji di van çapxanen de dihatin biciyanin. Karmendîn çapxanan, di destpêk de bi piranî ji Îstanbulâ dihatin şandin, lê paşiyê ji kesen ji cî ji hînî kar û barê çapê bûn û di van de-ran de karkirin.

Xustisiyeta Rojnamen Wi-layetan

Wek me di destpêk de ji got ev rojname, resmîbûn û di esasî xwe de kar û bar û siyaseta hukumeta Osmani û ya karbideşten wê yê wilayetan dida nîşandan. Li gor nîzamnamâ wilayetê, hemû nîvîsîn resmî û ne resmî di bin be-pîrsiyariya Nâmenvîsî Wilayetê (Vilayet Mektupcusu) de bûn. Loma, piranîya nîvîsan ji bal wan ve dihatin nîvîsin. Lî li gelek ciyan, redaksiyonek (heyet tehrik) ji dihat avakîrin û kesen ji herêmî "yê qelema wan xurt" ji di vê heyetê de cih digirtin. Carna ji di wilayetê de wezîfek resmî didan kesen ronak-bîr ên herêmî û bi vî awayî rî dihat vekirin ku ew di rojnamen de binivîsin. Piranîya nîvîsan ku di rojnamen de cih digirtin bê imze bûn. Mijara (mewzuya) nîvîsan li gor rewşa demê dihat guhertin. Di rojnamen de, qanûnen derketî, nîzamname, nîşankirina û bexşîkirina karmendîn dewletê, tayinkirin, bi serketinê hêzên ewlekarî (polis û esker), axaftin û nîvîsîn waliyan, beyanî resmî, kar û barêñ dezgîn dewletê wek xeber ci digirtin. Lî carna ji vê rewşa "klaşîkî" dihat derketin, helbest, lêkolîn, xebatêñ li ser dîrokê ji di rûpelên wan de xuya dibûn. Salen pişti 1890'ı nîvîsandinê edebî hatin qedexekirin (11).

Carnan ev rojname li ser rewşa abori û civakî ya hermî ji sekînîne û cîn dane probleman. Rojnamen wilayetan, li gor civaka Kurd her ci ne milî bûn ji di jîyana civakî, siyasi û kulturi ya welat de rolek gi-ring listine. Ü di ronikirina dîroka Kurdistanê, buyer û rûdanen dîrokî de meriv dikare wek çavkanî fêde ji wan bigre. Bi gelek awayen xwe, didin xuyakirin, ku cihekî wan di dîroka siyasi û kulturi ya Kurdistanê de heye divê iro di warê lêkolîn de li ser wan bê rawestan.

ÇAVKANI:

(1) Tanzimat'tan Cumhuriyet'e Türkiye Ansiklopedisi (Ji Tanzimat Heta Cumhuriyet'e Ansiklopediya Tirkîyê), İletişim Yayınları (r.98)

(2) a.n.d. (r.228-229)

(3) Yurt Ansiklopedisi (Ansiklopediya Welat), Anadolu Yayınları (r.2798)

(4) Tanzimat'tan Cumhuriyet'e... (r.99)

(5) Yurt Ansiklopedisi... (r.2334)

(6) a.n.d. (r.2334)

(7) a.n.d. (r.2574)

(8) a.n.d. (r.6948)

(9) a.n.d. (r.3074)

(10) Tanzimat'tan Cumhuriyet'e... (r.99)

(11) a.n.d. (r.101)

bosa besdarên şevê ku dixwestin herin pîrozbaşıya şeva Newrozê ya KKDK'ê li Köln. Di vê êris de şoreşgerekî Kurd bi kîrbi bîrindar bû. Yen êris biribûn ser otobosê; sisê ji wan ji bal polisê Alman ve hatin gîrtin.

Li Kölnê Apociyan bi bombe û kokteylên agirî êris birin ser merkeza KOMKAR'ê, merkez şewitandin. Cardin, li Hamburgê cihê komela KOMKAR'ê hat şewitandin.

Li Yewnanîstan, li Camp Lavron on êris birin ser kurdeki wela-tparêz ku ji bo xebata amedekirina şeva Newrozê çûbû kampê.

Di şeva pîrozbaşıya Newrozâ terefdarên Tevgera Sosyalist a Kurdistanê de û di şeva Partiya Komunist a Tirkîyê -Yekîtiyî (TKP-B) de Apociyan ser derxistin.

Êris û terora Apociyan li ser komele û şevê pîrozbaşı yê Kurdan li ser şoresger û welatparêz Kurde hîn dom dikan.

Rojnamen Tirk ên burjuazî û konsolosên Tirk ên welatên Ew-rûpa, meselê serûbinî hev dikan û dixwazin bidin nîşandan ku, ev şerî navxwe yê Kurde e. Dixwazin tevgera rizgarixwaziya Kurdi li deriveyî welat wek tevgeren terorist bidin nîşandan.

Hukumeta kevneperest a Alman li ser vê êrisê, dixwaze bi-hane ji xwe re çêke û hemû komelân Kurde terorist bide xwiyakirin û komelan bide gîrtin. Loma polise Alman naxwaze re li ber van êrisan bigre, ji bo bici-hatina bahana hukumeta kevneperest dixwaze bûyer hin gurrir. Roja 15 Adarê li Holandayê; li bajarê Deventer, Apociyan bi çek êris birin ser şeva Newrozâ ku ji bal Navendiya Çanda Kurdistan dihat amadekirin. Di salonê de demançe li besdarên şevê hat teqandin şes Kurd bîrîndar bûn. Pişti êrisê, 4 kes tevî çekên xwe ji bal polisê Holandî ve hatin gîrtin.

Pişti vê bûyerê bi çend rojan, li bajarê Bilefeld êris birin ser şeva Newrozâ ku ji bal terefdar û endamên rîexistina Kawa dihat çekirin. Lî xisarêk mezin çenebû.

Roja 21'ê Adarê li Bochum, Apociyan êris birin ser oto-

Navnîşana xwestinê
P. Box 240 12, 750 24 Uppsala
SWEDEN

ROJNAMA ŞARK VE KÜRDİSTAN

[ROJHILAT Ú KURDISTAN]

İstanbul 1908

MALMÎSANIJ

Par, nivîsek min û Mahmûd Lewendî li ser rojnamegeriya Kurdî di kovara Çarçira de derketibû ku me tê de behsa rojnama Şark ve Kurdistan ji kiribû. Me gotibû ku, ‘derheqê vê rojnamê de, di destê me de zanîn û agahdariyeke baş tune ye’. Lê demeke berê, dostekî hêja hejmara pêşin a rojnama Şark ve Kurdistan ji min re şand. Bi saya wî edi em vê rojnamê baştıri nasidikin. Digel ku ez ji ber hin mehzûran nikarim navê vî dostê hêja bidim jî, ez sipasî wî dikim û dixwazim li ser vê hejmara Şark ve Kurdistan’ê hin agahdariyan bidim. Barwîriya min ev e ku ji bo têgîhîstina dema çûyî, naskirina rojname kovarîn wê demê gelek girîng e.

★★★

Hejmara pêşin a rojnama Şark ve Kurdistanê di 25'ê Sevvala 1326'a / Teşrînîsanî 1342 / 1908 de derketiye û 4 rüpel e. Ebada fotokopiya ku ji min re hatiye şandin 23.4x30.8 cm. ye (İhtimal heye ku fotokopî hatibe piçukkirin).

Hemû nivîsên vê hejmarê bi Tirkî ya bi herfîn erebî ne - û di rüpela pêşin de weha hatiye nivîsin: “Nuha heftê du caran derdikeve”, “Rojnameyek e ku rewşa siyasi ya Rojhilatî û xerabiyê Rojava yê însaniyetê teswîr dike.”

Berpîrsiyarîn rojnamê: Ehmed Şerîfî Hersekî (Hersekî Ahmed Şerif), Bedriyê Meletiyê (Malatyali Bedri), û İsmailî Hersekî (Hersekî İsmail)

Mudîrî berpîrsiyar: Ehmed Şerîfî Hersekî.

Sernîvîskar: Bedriyê Meletiyê ye.

Derheqê du berpîrsiyarîn rojnamê, Ehmet Şerîfî Hersekî û İsmailî Hersekî de tu agahdariyîn me nînin. Lê tiştek bala mirov dişkîne ku nîvis û xeberîn rojnamê li ser Bosna Hersekî ne (Bosna Hersekî û 1878'an eyaleten Împaratoriyâ Osmani bû). Hersek bi xwe jî sencägeke Eyaleta Bosna'yê bû)

Em sernîvîskarî rojnamê, Bedriyê Meletiyeyî ji çend nivîsên wî nasidikin. Ji vanâ nivisa “Kurd û Kurdistan” di vê hejmara pêşin a Şark ve Kurdistanê de ye. Nivîseke

wî ya bi navê”

Kurd û Mêrxasiya Qewman” ji di hejmara pêşin a Kurd Teavün ve Terakki Gazetesi (Rojnama Alîkarî û Pêşketina Kurd) de derketiye.

Di hejmara pêşin a Şark ve Kurdistanê de nivîseke Mele Seîdê Meşhûr (Ku bi navê Seîde Kurdî yan jî Bediuzzeman Seîdê Nursî ji tê naskirin) ji heye. Mele Seîd, di vê nivîsa xwe de daxwaza vekirina dibistanê Kurdî li Kurdistanê dike (Nivîs bixwe, tenê wek daxwazname ji sultan re hatiye şandin). Em nivîsa Mele Seîdê Meşhûr

ya Bedriyê Meletiyê û nivîsa li ser Bedirxaniyan werdigirînin Kurdî û li jér pêşkeshi xwendevanan dikan.

Weşana yekemîn rojnama Kurdî, Kurdistan weki ku tê zanîn di sala 1902'yan de li Ewrupayê hatibû rawestandin. Bi qasî ku em dizanîn pişti vê rawestandinê, rojnama pêşin a ku ji alî Kurdan ve hatiye derxistin rojnama Şark ve Kurdistan e. Vê rojnamê di 1908'an de çend meh pişti flana Muşrûtiyet, li İstenbolê dest bi weşanî kiriye. Ji nave-roka wê tê xuyakirin ku li dijî Sultan Abdulhamîd, piştgirîya meşrûtiyetxwazan kiriye û bi taybetî di nivîsên jérîn de, li ser hin pirsên Kurdistanê sekîniye. Rojnamê bi tevâyî yekîtiya Împaratoriya Osmani parastiye.

Ci heyf ku em nizanîn çend hejmeren Şark ve Kurdistanê derketine û rojnamê heta kengî weşana xwe domandîye.

Hinek nivîs û xeberîn rojnamê di bin sernîvîsên jérîn de hatine weşandin:

—Kurd û Kurdistan - M. Bedri (Bedriyê Meletiyê)

—Ji kesen ku Dîxwazîn Welet Perce Bikin re - Bedri

—Konferans û Neticeyên wê yê - Muhtemel; İsmailî Hersekî

—Kurd Dîsan Muhtac in - Mele Seîdê Meşhûr

—Wasitên Neqliyê: Hemi-yeta Mili - Topçu Yüzbaşı Ali Vasfi

—Bosna Hersek û Boykotaj - Bedirxanî - Şark ve Kurdistan



Rojnama şark ve Kurdistan (Rojhilat û Kurdistan)

—Erîşa Katolikan li ser Mîsilmanan li Bosna Hersekê
—Li Bosna Hersekê
—Mesela Girîtê
—Mebûsân Kosovayê

(ji Şark ve Kurdistan [hej. I])

BEDIRXANÎ

Em bi hesret û hêvî li benda hatina Midhet û Ebdurrehman Beg ne ku li Ewrûpayê dest bi derxistina rojnama Kurdistanê kirene, di dewra çûyi ya bêyom de ji bo parastina mafîn esasî yên hemwelatî xeyret kirene û bi zeka û zanatiya xwe di nav heval û hogirêne xwe de navdar in.

Daxwaza me ew e: ev asîlzádeyên ku ci heq ci neheq dewletê wan kiriye hevkareñ (sîrikîn) gunehkaran (mîcîman) di demek nêzîk de bîghîn meramîn xwe û her yek ji wan li gor zanebûn û bîkîrhatîn xwe bibin xwedî meqamekî.

Şark ve Kurdistan (ji Şark ve Kurdistan [hej. I])

KURD Ú KURDISTAN

Kesen ku dibêjin qey li Kurdistanê wê li ruyê azadiya ku bi tîrêjîn edaleta xwe her quncikê welêt ronî dike, bi çavekî baş neyê nihîrtin; tenê ew kesen dilreş û çavkor in. Ev bîfîmîn reben... ev çavê kor wê ji ku rewşa rastîn a xelkê mezlum ê Kurdistanê û

halê giranê ruhuya wî zanibin yan bibin.

Kurdên reben: di peymana Berlinê de di konferansa La-hayê de, xirabiyê ku hukumeta çûyi li Kurdistanê bîcî kiribûn, girtin ser milê xwe. Frenk (rojavayî) yan ji hem-welatîn me yên wek wan ên ku tum tenê bi cîvekî li rastiye dinêrin û her eksî wê dibînin, di çapemeniya Rojava de halê Kurdish wek çîroka Resîkê Şevê weşandin... Xetarî, dizi di çavê dinya mirovatiyê de bûn sıfetîn me, em ji bûn mewsûfîn wan. Ci ku bû “tişte çû, mede dû” ew dewrana buxtan û zordariyê bû. Her çiqas gava ronahiyek piçûk ji bo eşkerekirina rastî û bêgu-nêhiyê bîhata vêxistin, bi derbîn hezar “of” an dihatin vemirandin jî, lê em ci bêjîn ku duh bi tuhmeta ji azadiyê a ku çavê meriv ji ber bîzayetiya wê venabe fîmîkînî em bi tiştekî hesab nedikirin. Li Kurdistanê behsa êrîşa Kurdish a ser hemwelatîyan dihat kirene ku bi xapandina birrek cahilan çedîbû.

Di vê dewra nû ya edaletê de, di meydana mukafatê ya welat û mîlet de gelo emê xwe musteheqî sıfetîn ku ne layiqî me ne, bibînin? Na! Em Kurd, ji xwe tu carî ne musteheqî van şîlmaqîn dewamî û van neheqîya ne. Delfîlén berbiçav ên xirabiyê plânkirî, ev grubûn ku dijî qanûna azadiyê, pêşveçûna welêt û yekîtiya mîletê ne, ew kesen fesad in ku mirovatiyê ber bi xirabiyê dibin. Em, ci Kurd, ci hemwelatîyen musulman û

xeyrî muslim ji xwe ji berê de bi hesret li benda vê kela (qel'a) bilind a azadiyê bûn ku iro hatiye fetihkirin. Em ê bi hemû xeyret û xebata xwe bidin nişandan ku em fedakarê vê Ke'ba Meşru û Meşrûtiyetê ne ku mîletê Osmanî ji salan ve ye bi hesret li pabokê (li bendê) bû. Dema buhurî mesûlyet xist hustuyê me, lê em ê bixebeitin da ku di rojîn pêş de bextiyar bibin!...

M. Bedri (Bedriyê Meletiyê)

(ji Şark ve Kurdistan [hej. I])

KURD DÎSA MUHTAC IN

Du belayê mezin hene ku heta iro Kurd mehû kirene; yek jê dubendiya navxwe ye, ya din ji baş belane-bûna hindekarî û zanînê ye. ji bo naskirina van her du bîlîyan, di dewra istibdadî de, Hezretê Bediuzzeman Mele Seîd, pêşniyarek dabû mabeynê (diwana Sultan) û li ser vê yekê pêrgiyî gelek musîbetan hatibû. Em ji nû ve weşandina vê pêşniyarê ifti-xar dikan:

“Her çiqas rewşa xelkê Kudistanê û ku beşekî girîngî Mîletê Osmanî ye, ji alî hukumetê ve baş tê zanîn jî, ez ji bo pêşniyarkirina hin daxwazîn li ser xizmeta pîroz a ilmî, içaze dixwazim. Ji bo ku di vê cîhana medeniyetê û di vê sedsala pêşveçûn û musabiqe de, di warê pêşveçûnê de wekhevîyek di nava me û birayê yên din de çêbîbe, her çiqas bi hewla

mesref tê kirene, bi vê; bingehê hîndekariye avadibe û ji bo avabûna destpêkî wê yekîti pêk bê. Û wê hîza mezin a ku ji ber dubendiyê navxwe vala diç, ger têkevî bin destê hukumetê ew ê cewahîrê xwe yê tebîî û qabilîyeta xwe ya medeniyetê nişan bide û derkeve ku çiqas musteheqî edaletê ye.

Mele Seîdê Meşhûr

Şêx Seîd kîjan e?



Risim-2; Şêx Seîd Pîrân; serokê serîhildana 1925'a.

Di teqwîmek 1985'a de a ku bi navê “Demokratîn Şoresger” hatiye çapkirin, rismî hin şexsiyeten dirokî ên Kurd hene. Li bin yekî ji wan ji navê “Şêx Seîd” hatiye nivîsin (binêre risim:1). Li jera rûpelê ji hatiye nivîsin ku “Fotograf ji arşîva Enstituya Kurd li Paris hatiye girtin.”

Risim, ê Seîd e, lê ne yê Şêx Seîd Pîrân ku serokatî Şoresger 1925'a kiriye; yê Bediuzzeman Seîdî Nûrsî ye. Seîdî Nûrsî ji Kurd e, Bedîsî ye û ji gundê Nûrsî ye. Berî avakirina Cumhuriyete Tirkîye bi navê Seîdî Kurdi dihat nasîn û ew ji di nav tevgera rizgarîxwaziya Kurd de bû. Pişti avabûna cumhûriyete, dev ji xebata Kurdevarîyê berda, xwe bi temamî da kar û barê dîmî û bi navê Seîdî Nûrsî, wek pêşberê Nurcîtiyê li Tirkîye nav û deng da, him li nav Kurdan him ji li nav Tirkan gelekk terdefdarîn wî çebûn. Gelek kitêbîn wî li ser tefîsîra hukmîn dîn hene; temamî eserîn wî bi navê “Rîsâle-i Nûr Küliyatî” tên naskirin.



Risim-3; Bediuzzeman Seîdî Nûrsî (Kurdî) gava li Dar-ul Hikmet-ul İslamiye endam bû, bi kurê birê kweyê Abdurrehman Nûrsî re.